

**FİQHNAMEYEKE MENZÛM DÎ EDEBİYATA KURDÎ DE:
RÎSALETU SEFÎNETU'L-EKRAD İLA SEBÎLÎ'R-REŞAD/SEFÎNA
KURDAN JÎ BO EHLÊ BAJAR Û GUNDAN A MELA EBDULCELÎLÊ BOTÎ**

Hayrullah Acar¹

Puxte

Edebiyata kurdiya klasîk mîna edebiyatên rojhilatê yên klasîk, referansa xwe ji dînê Îslamê werdigre. Di vê edebiyatê de helbest, tenê ji bo hunerê nayê nivîsîn. Gelek berhem bi mebesta fêrkirina mijarên dînî di forma helbestê de hatine nivîsîn. Berhemên derheqê fiqhê ku di mijarên eqîde û 'îbadetê de yên ku zanebûna wan li cem her misilmanekî ferz e di xwe de dihewînin, wek 'ilmêhal têne naskirin. Di edebiyata klasîk a rojhilatê de ev cure berhem ji bo ku bi hêsanî bêne jiberkirin bi gelemperî bi şiklekî menzûm hatine nivîsîn. Di edebiyata kurdî ya klasîk de berhemên menzûm yên ku di vî warî de hatine nivîsîn heta niha bi nêrîneke akademîk nehatiye nirxandin. Ji aliyê edebî ve nenirxandina van berheman kêmasiyek e. *Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad* berhemek orjînal e ku bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn. Di vê gotarê de em li ser berhemên ku bi vê cûreyê hatiye nivîsîn û bi taybetî jî li ser vê berhema ku ji aliyê Mele 'Ebdulcelîlê Botî hatiye nivîsîn rawestiyane. Ji bo vê xebatê 2 nusxeyên destxet yê *Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad* di destê me de hene. Di vê çarçoveyê de me metnê berhemê li gorî krîtîka metnê û nişandana ferqên her du nusxeyan herweha di çarçoveya rêzîkên erûzê de amade kir û berî metnê jî me ji aliyê naverok û ruxsarê ve agahî û analîzeke pêwîst derheqê mijarê de bi cih kir.

Bêjeyên Sereke: Fiqihnameyên Menzûm yên Kurdî, Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad-Sefîna Kurdan, Mele 'Ebdulcelîlê Botî, Mesnewî

**KÛRT EDEBİYATINDA MANZUM BİR FIKIHNAME:
MELA EBDULCELÎLÊ BOTÎ'NİN RÎSALETU SEFÎNETU'L-EKRAD İLA
SEBÎLÎ'R-REŞAD/SEFÎNA KURDAN JÎ BO EHLÊ BAJAR Û GUNDAN ADLI
ESERİ**

Öz

Klasik Kürt Edebiyatı klasik doğu edebiyatları gibi referansını İslam dininden alan bir edebiyattır. Bu edebiyatta şiir sadece sanat için yazılmaz. Bir çok eser dinî konuların öğretilmesi amacıyla manzum olarak kaleme alınmıştır. Fıkıh konusunda yazılmış ve her müslümanın bilmesi gereken bilgileri içeren eserler ilmihal olarak adlandırılırlar. Klasik

Makale gönderim tarihi: 15.03.2016, kabul tarihi: 07.04.2016

¹ Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Fakulteya Edebiyatê, Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî, Mêrdîn, Türkiye/Assistant Professor, Department of Kurdish Language and Culture, Mardin Artuklu University, Turkey
e-mail: hayrullahacar@hotmail.com

doğru edebiyatlarında bu tür eserler kolayca ezberlenmeleri amacıyla manzum bir şekilde yazılmışlardır. Klasik Kürt edebiyatında bu amaçla yazılmış eserler şimdiye kadar akademik bir bakış açısıyla değerlendirilmemiştir. Bu eserlerin edebi bir açıdan değerlendirilmemiş olması bir eksikliktir. *Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad İla Sebîlu'r-Reşad/ Sefîna Kurdan Ji Bo Ehlê Bajar û Gundan* bu alanda yazılmış orijinal bir Kürtçe eserdir. Bu makalede genel olarak bu konuda yazılmış eserler ve özellikle Mele Ebdulcelîlê Botî tarafından yazılan *Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad* inceleme konusu yapılmıştır. Bu bağlamda eserin metni metin kritiği tekniği ile ve iki nüsha arasındaki farklar gösterilerek hazırlanmış olup, metinden önce konuyla ilgili metnin şekil ve içerik bakımından değerlendirmesini içeren bilgiler de verilerek, analitik bir değerlendirme yapılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Kürtçe Manzum Fıkıhnameler, Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad-Sefîna Kurdan, Mele Ebdulcelîlê Botî, Mesnevî

A POETIC ISLAMIC LAW BOOK IN KURDISH LITERATURE: RÎSALETU SEFÎNETU'L-EKRAD İLA SEBÎLÎ'R-REŞAD/SEFÎNA KURDAN JÎ BO EHLÊ BAJAR Û GUNDAN BY MELA EBDULCELÎLÊ BOTÎ

Abstract

Classical Kurdish Literature, as other classical oriental literatures, takes Islam as its reference. In this literature poetry is not only for art's sake. Many works of arts were produced in verse to teach religious topics. Islamic law (fiqh) books that contain religious information every Muslim is supposed to learn are called Islamic manual (ilmihal). In classical oriental literatures such books were written in verse to facilitate memorization. The books produced for this purpose in classical Kurdish literatures have not been reviewed academically so far. There is also a void of literature review when it comes to such works. "*Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad İla Sebîlu'r-Reşad/ Sefîna Kurdan Ji Bo Ehlê Bajar û Gundan*" is an original Kurdish book written in this category. This article discusses the books falling in this category in general and *Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrad* by Mele Ebdulcelîlê Botî in particular. In this regard, the text of the book has been prepared using textual criticism technique and highlighting differences between two copies while offering an analytical assessment by providing details on the text beforehand.

Keywords: Kurdish poetic fiqhnames, Sefînetu'l-Ekrad-Sefîna Kurdan, Mele Ebdulcelîlê Botî, Masnavî

1. Destpêk

Di edebiyatên klasîk ên rojhilatê de cureyên edebî bi giştî li ser du beşan tên dabeşkirin: Cureyên edebî yê dînî û cureyên edebî yê beşerî-ladînî. Cureyên edebî yê dînî jî di nava xwe de li ser çar beşên sereke dikarin bî dabeşkirin: Cureyên bi Xwedê re têkildar, cureyên bi Pêxember re têkildar, cureyên dînî-tarîxî û cureyên bi zanistên Îslamî re têkildar. Di edebiyatên rojhilatê de, di van cureyên sereke de gelek berhemên menzûm hatine nivîsîn. Hin ji van menzûmeyan weke beşek ji dîwan û mesnewiyan, hin ji wan jî weke berhemên serbixwe hatine nivîsîn.

Cureyên edebî yên bi zanistên Îslamî re têkildar, ji ber ku li kêleka aliyê wan ê edebî, aliyê wan ê zanistên Îslamî jî heye, di mufredeta medreseyan de jî cih girtine. Ev yek vê cureyê ji yên din cudatir dike. Di nav berhemên bi zanistên Îslamî re têkildar de jî, bi taybetî yên derheqê zanista eqaid (eqaidname) û zanista fiqhê (fiqhname) de gelekî derketine pêş û belav bûne. Ev cure berhem di serdemên ewil de, ji bo zanayên ku perwerdeya dînê Îslamê didan, hatine nivîsîn. Ev berhemên ku hecm û naveroka wan diguherin, di pêvajoya demê de li gora pêwistiyan, di mijarên bingeîn de bi naverokeke xulasekirî, ji bo ku bi hêsanî bîna jiberkirin bi awayekî menzûm, bi zimanekî sade û bi uslubeke herikbar hatine nivîsîn. Ev cure berhem bi gelemperî di bin sernavê îlmêhalê de kom dibin û tarîxa telîfa van cure berhemên diçe heta sedsalên XV û XVIan.²

Di warê cureyên edebî yên bi zanistên Îslamî re têkildar de, herwekî erebî, farisî û tirkî bi zimanê kurdî jî komek berhemên menzûm hatine nivîsîn.³ Ji van menzûmeyan yên derheqê eqaidê de heta niha hindik jî be bala lêkolîneran kişandine, lêbelê di warê fiqhnameyên kurdî de tu xebat nehatine kirin. Ji ber vê yekê jî em dixwazin di vê gotarê de li ser fiqhnameyê menzûm a Mele ‘Ebdulcelîlê Botî bi navê *Sefînetu’l-Ekrad* rawestî û cihê wê di edebiyata kurdî ya dînî de destnîşan bikin. Di çarçoveya agahiyên li ber destan ji ber ku ev berhema yekem a warê xwe ye, *Sefînetu’l-Ekrad* jî aliyê zanistî ve girîngiyê taybet bi dest dixê. Derheqî vê berhemê de tenê projeyek temamkirinê hatiye amadekirin.⁴ Lêbelê di vê xebatê de ji bilî latînzekirineke sade ya metnê berhemê, tiştêkî din nehatiye kirin. Li aliyê din jî ber girîngiya berhemê ihtiyac bi xebateke zanistî û berfireh hebû. Ji ber vê yekê me metnê berhemê ji nû ve latînzê û transkîrîbe kir. Piştî ku me bi vî çavî lêgerînek kir, me nusxeyêkê dîtîr a fiqhnameyê jî bi dest xist. Vê yekê jî ji bo xebata li ser vê berhemê em han dan ku di encamê de ev gotar derket meydanê. Di vê gotarê de me metnê berhemê li gorî krîtîka metnê û nişandana ferqên her du nusxeyan, herweha di çarçoveya rêzîkên erûzê de amade kir û berî metne jî me agahî û analîzeke pêwîst derheqê mijarê de bi cih kir.

2. Çarçoveya Têgehî: Fiqih, Îlmêhal û Fiqhname

Fiqh zanistê Îslamî ye ku mijara wê pratîk û rîtuêlên dînê Îslamê ne ku ev yek bi taybetî ibadet û danûstandinên di navbera insanan de di xwe de dihevin. Fiqih, tê wateya hiqûqê dînê Îslamê. Ji aliyê ‘emelî (pratîkî) ve ji bo her muslimanekî zanîna tiştên di leh û eylehê xwe de wek fiqh tê pênasekirin. Bingeha wê Qur’an û sunneta pêxember e. (Karaman, H., 1996: r. 1-14) Di çanda Îslamî de ji berhemên ku derheqê vê mijarê de hatine nivîsîn re îlmêhal jî tê gotin. Peyva îlmêhalê wek têgeh, li gora prensîbên dînê Îslamê zanebûna çareserkirina pirsgirêkên ku her misilman di jiyana rojane de rastî wan tê îfade dike. Bi vê mebestê gelek îlmêhalên ku van agahiyên zerûrî di xwe de dihevin hatine nivîsîn. Di edebiyata klasîk de berhemên ku di vê mijarê de bi awayekî menzûm

² Di vê mijarê de ji bo agahiyên zêdetir bnr. Kelpetin, H. 2000: r. 139.

³ Di vê mijarê de ji bo agahiyên giştî bnr. Abdurrahman Adak, “Di Edebiyata Kurdiya Klasîk de Cureyê Edebî: Zanistên Îslamî”, Nûbihar, j. 132, Havîn 2015, r. 5.

⁴ Ji bo vê projeyê bnr. Mehmet Tahir Kurt, Berhemek Kurdî ya Derheqê Fiqhê Sefîna Kurdan û Latînzekirina Wê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Mêrdîn 2015.

hatine nivîsîn wek “fiqhname” hatine binavkirin. Di nava van cure berheman de mijarên fiqhê yên wek nimêj, rojî û hecê bi cûreya mesnewiyê wek berhemên serbixwe hatine nivîsîn. Berhemên ku derheqê nimêjê de hatine nivîsîn bi tevayî wek “Şurûtu’s-Salat” hatine binavkirin. Di van cûre berheman de mijarên wek ferzên nimêjê, ferzên xuslê, sunnet, musteheb û mekruhên wê têne vegotin. Berhemên bi vî rengî ji ber ku bi mebesta fêrkirinê têne nivîsîn, wek berhemên “te’lîmî” têne navdan û ji aliyê hêza edebî ve lawaztir in. Di van cûre berheman de ji ber ku mebesta helbestvan ne endîşeya hunerê ye qusûrên weznê bi zêdeyî têne dîtin. (Kelpetin, H., 2000: r. 139-141)

3. Di Edebiyatên Rojhilatê de Fiqhnameyên Menzûm

Ji ber ku zanistên Îslamî pêşî bi zimanê erebî hatine nivîsîn, bi awayekî siruştî fiqhnameyên menzûm jî pêşî bi vî zimanî hatine nivîsîn. Wexta ku meriv bala xwe dide berhemên bibliyografîk ên ku bi zimanê erebî hatine nivîsîn, gelek berhemên ku di warên tecwîd, feraiz, eqaîd û fiqhê de hatine te’lîf kirin derdikevin pêşberî me. Di mijara fiqhê de dîroka nivîsîna berhemên menzûm diçe heta serdema Ebbasiyan. Yekem kesê ku di vî warî de berhem nivîsiye Eban b. Ebdulhemîd el-Lahîkî (w. 200/815) ye û berhema wî menzûmeyer derheqê Rojî û Zekatê de ye. Eban, di menzûmeya xwe ya ku bi mebesta fêrkirinê nivîsî de ji Qur’an û hedîsan mijarên bi zekat û rojiyê têkildar iqtibas kiriye û hukmên wan li gora mezhebê Henefî şîrove kiriye. (Bnr. Tuzcu K., 2012: r. 19; Yıldırım, K., 2009: r. 171-207) Bi qasî ku tê dîtin piştî fiqhnameyên erebî, yên farisî, pey wê re yên tirkî, pey wê re jî yên kurdî û zimanên din hatine nivîsîn. Di sehaya Îranê de gelek kesan fiqhnameyên menzûm nivîsîne. Ji van fiqhnameyan *el-Cewhereti fî Nezmî Tebsereti* ya Hesên b. ‘Elî b. Dawud Hillî (w. H. 647), *ed-Durretu’n-Necefiyye an ed-Durretu’l-Behiyye fî Teharet we’s-Selat a Seyyid Mehdî Behru’l-Ulûm Brucerdî* (h.1155-1212), *Menzûmeti fî’l-Xinaiya* ya Ayetullah Şêx Muhemmedê Tehranî (H.1253-1320), *Ercuzet fî’l-Et’îme we’l-Eşrîbe an Menzûmeyê Ibnî A’sem fî’l-Me’kel we’l-Meşrib a Ibnî A’sam Muhemmed b. Elî b. Huseynê Zebîdî Necefî* (w. 1233), *Menzûmetun fî’r-Rida’ an el-Ercuzeti’r-Ridaiyye we Şerhiha* ya Seyyid Sadreddîn Muhammed b. Salihê ‘Amulîyê Îsfehanî (w.1263) wek fiqhnameyên herî girîng derdikevin pêş. *Menzûme fî Şukûki’s-Selat a Şêx Ehmedê Setrî* (w.1315), *ed-Durretu’l-Beyda* ya Seyyid Mîrza Ebu’l-Qasim, *el-Cennetu’l-Me’wa* ya Seyyid Muhemmed b. Ebdussemedê Îsfehanîyê Şehşehanî (w.1287), *Zebiras el Huda* ya Hac Mela Hadiyê Sebzewarî (w.1289), *Ercuze fî’s-Sewm we’l-Îtikaf we’l-Xums a Seyyid Muhemmed Huseynê Bexdadî Necefî* (w.1394), *Menzûme fî’s-Sewm we’l-Xums we’l-Hecc a Şêx Abbas b. Şêx Hesên b. Kaşifu’l-Xita* (w. 1323), *Ercuze fî Tuhfetu’n-Nisak a Şêx Tahir Heççamiyê Kebîr* (w.1279), *Menzûme fî’n-Nikah* Şêx Huseyn b. Şêx Meşkurê Hewlawî (w. 1388) jî wek fiqhnameyên talî yên edebiyata farisî dikarin bên hesabandin. (Îmamzade, S. M., 1388: r. 11-42)

Dema ku meriv bala xwe dide keresteyên çandî yên tirkî ên piştî qebulkirina dînê Îslamê, tê dîtin ku ev qebûl, liv û tevgereke berbiçav xistiye nava edebiyata tirkî. Piştî qebulkirina dînê Îslamê bi rêya te’lîf û wergerê di warê fiqh, kelam, tesewwif, qisseyên ewliya û pêxemberan, pirtûkên tebeqat û menaqîban, tewhîd, munacat, ne’t, mi’raciye,

wergerên çil hedîsan, mewlûd, şemaîl, eqîde, nimêj û rojîyê de gelek berhem hatine nivîsîn. (Levend, 1972: s. 35-80; Çelebioglu, 1983, r. 153-166).

Di serdema Osmaniyan de nimûneyên ewil yê 'ilmêhalan bi riya wergerê derketine meydanê. Rîsaleya *Muqeddîme* ya Ebu'l-Leysê Semerqendî ku derheqê nimêjê de hatibû nivîsîn, ji aliyê Qudbeddînê Îznîkî ve bi navê *Kîtabu'l-Muqeddîmeyê* hatiye wergerandin û di dema Osmaniyan de ji yekem berhemên ku di warê ilmêhalê de hatiye nivîsîn tê hesabandin. (h.g., r.140) Dîsa *Umdetu'l-İslam* a Ebdulezîzê Farîsî ji aliyê Ebdurrehmanê Aqsarayî ve digel mijarên nû bi navê *'İmadu'l-İslamê* di dema Osmaniyan de hatiye wergerandin. Cardin berhemêke din ya ku texmînen di sedsala XII an XIIIan de bi cureya ilmihalê hatiye nivîsîn, berhema bi navê *Guzîde* ya ku bi tirkîya Harezme hatiye nivîsîn, ji aliyê Mehmed b. Balî ve di sedsala XV. de tercumeyî tirkîya Enedolê bûye. (Kelpetin, H. 2000: r. 139) Hin ji van di nava dîwanên muretteb û mesnewiyan de, hin ji van wek berhemên serbixwe hatine tertîbkirin. Wek *Wikayename* ya Devletoglu Yusuf (w. 828/1424), *Mesnewiya Rawzatu'l-İman* a Xelîlî (sedsal XVI), *'İlmêhala Menzûm* a Elî Efendî, *Feraîza Menzûm* a İbnu'l-Haim (w. 815), *Kîtab-i Rûşenî* ya Reyyî, *Muhtasar Wikaye Tercumesi* ya Şemsî Paşa (w. 1580), *Menasiku'l-Huccac* a Şemseddînê Siwasî (w. 1597), *Rawzatu'l-İslam* a 'Abidî, *'İlmihala Menzûm* a Mehmet Rif'etê Manastirî (w. 1907), *Menzûme fî 'İlm-i Hal* a Sadî Efendî yê Vîdînî, *Menzûmeyê Huda Rebbim* a Sunullahê Xeybî. (Kırkıl, H., 2006: r.438)

4. Di Edebiyata Kurdî de Fiqhnameyên Menzûm

Di edebiyata kurdî de li ser esasên fiqhê û bi taybetî nimêjê gelek menzûme hatine nivîsîn. Lêbelê berî ku em bi firehî behsa fiqhnameyên menzûm bikin, em dixwazin bale bikişînin ser berhemên fiqhê yê pexşan jî. Tarîxa nivîsîna berhemên fiqhê yê pexşan zêde ne kevin e û yê ku em pê dizanin di serdema Komara Tirkiyeyê de hatine nivîsîn. Wek îstisna, pirtûkek ilmêhalê ku di dewra Osmaniyan de di sala 1308/1891ê bi emrê wîlayeta Mamuretu'l-Ezîzê (Elezîz) ji tirkî bal bi kurdî ve hatiye wergerandin, bi navê *"Türkçe'den Kürd Lisânına Mütercem İlmihâldir"* yekem ilmêhala kurdî ya wergerê ye. Wergêrê vê ilmêhalê mamosteyekî bi navê Omer Ferîd e. (Serfiraz, M., 2013: r. 55-60)⁵ Bê şik û guman Xelîfe Yusifê Beyazîdî di warê ilmihalên pexşan de wek nûnerê herî girîng derdikeve pêş. Lewra wî di vî warî de hem berhemên bi hecm nivîsîne, hem jî berhemên wî hatine çapkirin û di medreseyan de wek kitêbên dersê hatine xwendin. Ji van berhemên wî *Irşadu'l-'Ibad* û *Tuhfetu's-Sibyan* bi taybetî girîng in. Di wî warî de digel ku gelek Berhem hatine nivîsîn jî behsa *Tuhfetu'l-Muสลîmîn* ya Şêx Hesên Şêx Yasîn, *Hediyyeti's-Sixar Fî Tercemeti Xayeti'l-İxtisar* a Mele Zeynelabidînê Amedî û *Tuhfetu'l-Ebrar Şerhê Xayeti'l-İxtisar* a Şêx Mûsayê Mardînî jî dikare bê kirin.

Dema em li fiqhnameyên menzûm ên edebiyata kurdî dinerin, bêguman ew ji yê pexşan gelekî zêdetir in. Lêbelê bi qasî ku tê dîtin di tarîxa edebiyata Kurdî de nivîsîna menzûmeyên serbixwe yê fiqhî jî wek yê pexşan zêde ne kevin e. Di serdema mîrektyên

⁵ Herwiha ev 'ilmêhala werger, di serdema Osmaniyan de duyem pirtûka kurdî ya çapkirî tê zanîn. Berhem, li gor mezhebê Henefî hatiye amadekirin. Nuseyek wê li Pirtûkxaneya "İstanbul Beyazıt Devlet Kütüphanesi"yê de bi jimara " Bayazıt 7515" tomarkirî ye. Ji bo agahiyên firehtir bnr. Mesut Serfiraz, "Türkçe Kürtçe Bir İlmihal", *Kürt Tarihi*, j. 5 (Sibat-Adar), İstanbul, 2013, r. 55-60.

kurdan de di hin berhemên wek *Nehcul'l-Enama* Mela Xelîlê Sêrtî de, bi awayekî sînorkirî behsa adabên nimêjê hatiye kirin. Di çarçoveya agahiyên heyî de yekem menzûmeya fiqhê ya serbixwe di serdema Komarê de hatine nivîsîn ku ew jî mijara vê gotara me *Sefîna Kurdan* a Mela Ebdulcelîlê Botî ye. (Tarîxa nivîsînê: 1951)

Adak, di xebata xwe ya ku li ser menzûmeyên bi zanistên Îslamî re têkildar de cih daye 15 heb fiqhnameyên menzûm û ew jî ji aliyê hecmê ve li ser sê beşan dabeş kirine: Fiqhnameyên giştî, îlmêhal û fiqhnameyên spesîfik. (Adak, A., 2015: r. 5-9)

4.1. Fiqhnameyên Giştî

Ev menzûme bi armanca ku hemû mijarên fiqhê di xwe de bihewînin hatine nivîsîn. *Sefîna Kurdan* a Mela Ebdulcelîlê Botî, *Kurtiya Fiqha Şafi'î bi Sual û Cewab û Nezma Kurmancî* (nivîsîn: 1993) a Mela Ehmedê Zinarexî, *el-Fiqhul'l-Menzûma* Mela Arif b. Yûsif Dêrsilavî û *Rewşena M. Şefîk Aksu* (Siirt 2011) di vê çarçoveyê de hatine nivîsîn.

4.2. 'Îlmêhal

Hin ji menzûmeyên fiqhê bi 'îbadet û rîtuêlên dînî, yan jî pênc rîknên Îslamê hatine sînorkirin û mijarên mu'amelatê di xwe de nehewandine. Ji ber ku ev berhem ji bo zanyariyên pêwîst ên rojane hatine nivîsîn wek *îlmêhal* jî dikarin bîn binavkirin. Berhema Şêx Hebîbê Qadî (k.d. 1978) a bi navê *Fewzu'l-Enâm fî Îbadeti Rebbi'l-Enâm ela Mezhebi İmami's-Şafi'î* ji bo vê cureyê nimûneyeke grîng e. Hin menzûmeyên di vê kategoriyê de wekî beşeke eqîdeyê hatine nivîsîn. Bo nimûne di *Eqîdetu'l-İman* a Mela Mihemedê Hezanî de 78 beytên pêşî derheqê eqaidê û 46 beytên dawiyê jî derheqê fiqhê de ne. Hezanî heman rêbaz di *Eqîdetu'l-İmana* xwe ya Zazakî de jî şopandiye.⁶ Di vir de jî 95 beytên pêşî derheqê eqaidê û 48 beytên dawiyê derheqê fiqhê de ne.

4.3. Fiqhnameyên Spesîfik

Hin ji menzûmeyên fiqhî li ser mijareke taybet hatine nivîsîn. Bo nimûne bi kurdiya kurmancî *Delailu's-Selat 'ela Mezhebi'l-İmam eş-Şafi'î ya* Mela Se'îdê Taxikî derheqê nimêjê, *Buxyetu'l-Mutedeyyinîn fî Mebahis Huqûqi'l-Muteexxirîn*, (nivîsîn 1417) a Muhemmed Nûreddîn Şêx Muhemmed Sahib û *Keşfu'l Ferâiz* a Mela Abdulhadî Comânî (k.d. 2001) derheqê feraizê û *Kitabu'l-Mubah fî Bahsi'n-Nikah* a Şêx Hebîbê Qadî (k.d. 1978) derheqê nîkahê de hatine nivîsîn. *Hecnameya* Mela Ebdulkerîmê Muderris ku derheqê hecê de hatiye nivîsîn, nimûneyek e ku bi kurdiya soranî hatiye nivîsîn. (çap: Întîşaratî Kurdistan Sine 1390)

Li jêrê em dê ji van fiqhnameyên kurdî li ser çend nimûneyan rawestin û wan bidin nasandin:

Mele Ehmedê Zinarexî: *Fiqha Şafi'îyan*

Navê eslî yê vê berhemê "*Kurteya Fiqha Şafi'î Bi Sual û Bi Cewab û Nezma Kurmancî*" ye. Berhema ku bi terzê mesnewiyê hatiye nivîsîn ji derdora 1500 beytan pêk tê. Bi xettê muellif, di nava du cildan de bi terzê ofsetê hatiye çapkirin. Mela Ehmed, ev

⁶ Ji bo xebata ku li ser vê berhemê hatiye çêkirin bnr. Metin Çiftçi, *Eqîdenameyo Zazakî yê Mela Mehemedê Hezanîyî*, Yaşayan Diller Enstîtüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl, 2015.

pirtûka xwe ya ku derheqê fiqha mezhebê Şafîî de ye bi sual û cewab û bi nezm nivîsiye da ku zarokên kurdan bi alîkariya vê pirtûkê bi zimanên xwe di wextekî hindik de fiqha Şafîî hîn bibin û jiber bikin. Nivîskar di vê pirtûka xwe de fiqha mezhebê Şafîî bi qasî pêdiviya zarokan aniye ziman. Piraniya meseleyên fiqhê yên wek av, paqijî, îbadet, mu'amelat, 'uqûbat, cîhad, nêçîr, sond û kefarete, hakim, hukm, heq û huqûqê di berhemê de cih digirin. Mirov dikare bibêje ku meseleyên fiqhê yên bingehîn bi temamî û bi kurtasî di berhema xwe de aniye ziman. Mela Ehmed ev pirtûka xwe di 4ê Adara sala 1993yan de temam kiriye.⁷

Mele Arif b. Yusiv Dêrsilavî: *el-Fiqhu'l-Menzûm*

Mele 'Arifê Dêrsilavî ji navçeya Stewrê ya Mêrdînê ye. Navê tam yê berhemê ev e: "*el-Fiqhu'l-Menzûm we fî Zeyle'd-Delaîl el-Qewiyye mine'l-Ayati'l-Qur'aniyye*. Berhema ku li gora fiqha Şafîî bi şeklê mesnewiyê hatiye nivîsîn, ji 1500 beytan pêk tê. Hemî mijarên fiqhê di nava xwe de dihevine. Di binê her rûpelê de wek têbînî, bi zimanê erebî, ayet û hedîsên ku çavkaniyên mijarê ne hatine bicîkirin. Berhem di sala 1979an de li Diyarbekirê bi xettê Mele Mihemed b. Ebdurrehman ve hatiye îstînsaxkirin û bi çapa ofsetê hatiye çapkirin.

Mele Mihemed Şefîq Aksu: *Rewşen*

Mele Mihemed Şefîq Aksu, kurê Mele Ebdulhekîmê kurê 'Emerê Mehmûdê feqe Hacî ye. Di sala 1958an de li gundê Memîra, navça Dihê/Erûhê ya bajarê Sêrtê hatiye dinê. (Aksu 2010, r. 1) Berhema wî ya menzûm ku mesnewiyeke bi navê *Rewşen* e, ji du beşan pêk hatiye. Ji destpêkê heta rûpela 43an behsa mijarên eqaidê kiriye. Ji rûpela 43an heta 121 ango heta dawiyê fiqha menzûm e. Beşa eqidê ji 860 beytan, beşa fiqhê jî ji 1560 beytan pêk hatiye. Di berhemê de hemû mijarên fiqhê li gora mezhebê Şafîî hatiye nivîsîn. *Rewşen*, bi du alfabeyan hatiye çapkirin. Rûpela milê rastê bi alfabe ya erebî, ya milê çepê jî bi alfabe ya latînî hatiye nivîsîn.

Mele Se'îdê Taxikî: *Delaîlu's-Selat 'Ela Mezheb el-Îmam el-Şafîî*

Mele Se'îdê Taxikî, ji navçeya Farqîna Amedê ye. Berhema wî ya menzûm ku bi giştî li ser nimêjê hatiye nivîsîn ji 460 beytan pêk tê. Berhem piştî destpêkek ku ji 31 beytan pêk tê, li gora mezhebê Şafîî, di bin sernavê 8 "mebhes"an de bi rêzê; ji binbeşên "Furudu'l-Wudu", "Sunenu'l-Wudu", "Ferdu'l-Xusl", "Sunenu'l-Xusl", "Şurûtu's-Selat" û "Erkanu's-Selat"ê teşkîl dibe. Berhem ji aliyê Mele Zeynelabidînê Amedî ve di tarîxa 2000î de hatiye îstînsaxkirin.

Mele Mihemedê Hezanî: *'Eqîdetu'l-Îman*

Ev berhema ku bi kurdiya Kurmancî hatiye nivîsîn ji 124 beytan pêk tê û 78 beytên vê berhemê derheqê eqaidê û 46 beyt jî derheqê fiqhê de ne.

⁷ Ev agahî ji Dr. Taha Nas ê kurê nivîskar hatiye wergirtin.

Mele Mihemedê Hezanî: ‘Eqîdetu’l-Îman

Ev berhema ku ji aliyê heman kesî ve bi kurdiya Zazakî hatiye nivîsîn ji 143 beytan pêk tê. 95 beytên vê berhemê derheqê eqaidê û 48 beyt jî derheqê fiqhê de ne. Berhem bi destê Mele Zeynelabidînê Amedî ve hatiye îstinsaxkirin.

5. Mele Ebdulcelîlê Botî û *Rîsaletu Sefînetu’l-Ekrad Îla Sebîli’r-Reşad Sefîna Kurdan Ji bo Ehlê Bajâr û Gundan*

5. 1. Jiyana Mele Ebdulcelîlê Botî

Li gorî agahiyên ku Mele Usameddîn (Öncü) neviyê Mele Ebdulcelîl dane me, muellifê Sefîneyê Mele ‘Ebdulcelîl, bi eslê xwe Botî ye, yanî ji herêma Botan e. Ew li gundê Zivingê ku li ser navçeya Dihê/Eruhê ye hatiye dinyayê. Navê bavê wî Ebdulhemîd⁸, navê diya wî Wesîle ye. Bavê wî, Mele Ebdulhemîd jî seydayekî medreseyê bûye. Mele Ebdulhemîd, digel birayê xwe Mele Xelîl ji bo tehsîla medreseyê ji herêma xwe koçî devera Mêrdînê kirine û li gundê Dêrîş ku gundekî eşîra Surguçiyîyan e û di fermiyetê de jî girêdayî navçeya Stewrê ye bi cih bûne. Mele Ebdulhemîd û birayê xwe Mele Xelîl li gundekî din ê eşîra Surguçiyîyan bi navê Dengizî⁹ li cem kesayetekî navdar bi navê Şêx Îsayê Dengizî¹⁰ perwerdeya medreseyê dîtine û li cem wî kesî îcaze stendine. Piştî ku îcaze stendine Mele Xelîl, li gundekî bi navê Şorşibê bi cih bûye û li vî gundî melatî kiriye. Mele Ebdulhemîd jî li Dêrîş bi cih bûye û li wir bi Wesîle Xanima keça seydayê xwe Şêx Îsayê Dengizî re zewiciye.

Dîsa li gorî agahiyên ku Mele Usameddînê neviyê Mele Ebdulcelîl dane me, Mele Ebdulcelîl, piştî avabûna komara nû, ji ber zextên zordestiya komarê, koçî Şamê kiriye û bûye hemwelatîyê Sûrî. Li Şamê li Taxa Salihîyê melatî û muderristî kiriye. Bi qasî 6-7 salan çûye Mekkeyê û li wê derê jiyaye. Di vegeerê de cardin hatiye Şamê û di sala 1994an de li wir wefat kiriye. Çaxa ku wefat kiriye temenê wî derdora 70-75 salan de bûye. Gora wî li Taxa Salihîyê, li kêleka gora Mewlana Xalidê Şehrezorî ye. Çar kurên Mele

⁸ Li gorî qeyda temellukê ya li ser zehriyeya nusxeya Mela Mehdî ku bi zimanê erebî hatiye nivîsîn, navê bavê Mela Ebdulcelîl Mustefa ye: ‘‘Sahibihû we malikihû Muhammed Monla ‘Ebdulcelîl bin Melle Mustefa el-merhûm rehmetullahî ‘eylehî amîn welhemdulillahî rebbil ‘alemîn’’. Ango; ‘‘Xwediyê vê destxetê Muhammed Mele ‘Ebdulcelîl kurê Melle Mustefayê rehmetî. Rehmeta xwedê li ser wî be amîn. Hemd ji bo xudayê ‘alemê ye.’’ Aşkera ye ku vv agahî û agahiya ku Mele ‘Usameddîn dide li hev nayên.

⁹ Derheqê herêma Surguçiyîyan û van gundan de bnr. Altan Tan, *Turabidîn’den Berriyê’ye Aşiretler, Dinler, Diller, Kültürler*, Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 282-287.

¹⁰ Şêx Îsayê Dengizî seydayekî mezin bûye. Li Medreseya Qasimiyê ya Mêrdînê muderristî kiriye. Ev Şêx Îsa, xelîfeyê mutessevifê navdar Şêx Hamidê Mêrdînî ye. Şêx Îsayê Dengizî 4 kur hebûne. Navê wan: Mele Mihemedê Dêrîş, Mele Ebdulkerîm, Mele Ebdurrehîm û Mele Mihemed Se’îd. Ji nava van kesan Mele Mihemed, çiyekî xwe yê taybet heye. Alimekî navdar û xwedî berhem bûye. Ji bilî kurdî, bi erebî û bi farsî jî berhem nivîsîne. (Çavkanî: Mela Usameddîn Oncu/Diyarbakir) Li gorî agahiyên ku me ji devê Ercan Alpay ku neviyê Mele Mihemed e wergirtine, malbatê berhemên wî neqlî muzexaneyê Şaredariya Bajârê Mezin a Diyarbakir kirine û li vê muzexaneyê di binê parastinê de ne. Ev berhem bi xettê Mele Mihemed û bi zimanên kurdî, erebî û farsî hatine nivîsîn. Mele Mihemed temenekî dirêj jiyaye. Hevaltî û dostaniyeke wî û Şêx Ebdurrehmanê Axtepî (1907) jî hebûye. Mele Mihemed di sala 1960î de wexta ku koça dawî kiriye 113 sal emr kiriye. Mele Ebdulkerîm li Dengiza, Mele Ebdurrehîm li Quzêrîb û Mele Mihemed Se’îd jî li Qiziltepe/Qoserê melatî kirine.

Ebdulcelîl hene: Mihemed Mekkî, Hemîd, Mustafa û Ebdurrehman. Ji vana Mihemed Mekkî li Şamê dijî; yê din koçî Elmanyayê kirine.

Herçiqas derheqê hin hûrguliyên jiyana wî de, ji aliyê neviyê wî ve agahiyên zêde nehatine dayîn jî, em ji temenê wî û tarîxa nivîsîna berhemê dikarin hin encamên girîng ên jiyana wî bi dest bixin. Dema em li wefata wî dinêrin, wî di sala 1994an de 70-75 salî wefat kiriye. Ev jî lazîmî xwe dike ku ew di navbera salên 1919-1924an de hatibe dinyayê. Naxwe Mela Ebdulcelîl tam di wextê avakirina Komara Tirkîyeyê de hatiye dinyayê û perwerdeya xwe ya medreseyê jî di maweya qedexeya medreseyan de bi awayekî veşartî kiriye. Bi rehetî dikare bê gotin ku wî, li cem melayên ku wê demê li herêma Surguçiyân dersdarî kirine xwendiyê. Malbata Şêxên Hamidiyan li gundê Ehmediyê û Şêx Îsayê Dengizî li gundê Dengiza nimûne ji du derdorên vê demê dikare bê jimartin. Dema em li tarîxa nivîsîna berhema wî dinêrin, wî berhema xwe di sala 1951ê de nivîsiye. Ev jî di zelalkirina qonaxên jiyana wî ya Tirkîye û Sûriyeyê de xaleke gelekî ronîker e. Lewra pêwîst e ew heta bi vê salê li Tirkîyeyê mabe. Eger wî berhema xwe li Şamê nivîsîbûya, gihîştina berhema wî heta bi herêma Surguçiyân û îstînsaxkirina wê li wê herêm gelekî zehmet bû. Dema em bi vî çavî li mijarê binêrin, dê derkeve holê ku nivîskar berhema xwe di navbera 27-32 saliya xwe de nivîsiye û pey vê tarîxê re koçî Sûriyeyê kiriye.

Dîsa li gorî agahiyên ku Mele Usameddîn dane me, xwişka Mele ‘Ebdulcelîlê Bofî bi Mele ‘Ebdulkerîmê kurê Şêx ‘Îsayê Dengizî re zewiciye. Mele ‘Ebdulkerîm birayê Seydayê Mele Muhemmedê Dêrîş e. Mele Mihemedê Dêrîş, di herêmê de seydayekî navdar bû. Bi navê Mele Munîr, Mele ‘Îsa û Mele Mehdî sê lawê Mele ‘Ebdulkerîm hene. Ji vir jî derdikeve ku Mele ‘Ebdulcelîl xalê Mele Munîr, Mele ‘Îsa û Mele Mehdî ye. Mele ‘Îsa bi qîza xalê xwe Mele ‘Ebdulcelîl re zewiciye û bi navê Mele ‘Usameddîn kurekî wan çê dibe ku di vê gotarê de gelek agahiyên derheqê Mele Ebdulcelîl de me ji wî bi dest xistine.

5. 2. Rîsaletû Sefînetu’l-Ekrad İla Sebîli’r-Reşad/Sefîna Kurdan ji bo Ehlê Bajar û Gundan

Li gorî agahiyên ku Mele Usameddîn dane me, Mela Ebdulcelîl ji bilî vê berhema xwe gelek helbest jî nivîsîne. Ev helbest îro li cem kurê wî yê biçûk Mihemed Mekkî ne. Herçiqas Mela Usameddîn daxwaza kopiyeke van helbestan kiriye jî, kurê wî ev helbest nedane Mele Usameddîn. Ji ber ku ev helbestên wî niha ne li ber destên me ne, mixabin em li vê derê bi tu awayî nikarin nirxandinekê li ser wan bikin û em ê di vê beşê de bi temamî li ser berhema wî ya navborî rawestin.

Cihê Berhemê di Tarîxa Edebiyata Kurdî de

Rîsaletû Sefînetu’l-Ekrad İla Sebîli’r-Reşad/Sefîna Kurdan Ji bo Ehlê Bajar û Gundan berhemeke girîng e ku Mela Ebdulcelîl di sala 1367/1951ê de nivîsiye û pêşkêşî pirtûkxaneyê Kurdî kiriye. Dema em jidayîkbûna wî (navbera 1919-1924) û tarîxa nivîsîna berhemê (1951) li ber çavan bigirin, derdikeve holê ku nivîskar berhema xwe di navbera 27-32 saliya xwe de nivîsiye. Bêguman di vî temenê de nivîsîna berhemeke bi vî rengî ji bo nivîskar serkeftineke mezin e.

Berhem fiqhînameyek e ku tê de li ser mijarên fiqhê hatiye rawestan. Fiqhîname jî cureyeke edebî ye ku bi zanistên Îslamî re têkildar e. Di serdema mîrektîyan de eqîdename

hatine nivîsîn, lêbelê bi qasî ku em dizanin fiqhname nehatine nivîsîn. Di çarçoveya agahiyên li ber destan *Sefînetu'l-Ekrad* hem di cureya xwe de, hem jî bi giştî di tarîxa edebiyata kurdî de dibe fiqhnameya yekem. Ji van aliyan ve *Sefînetu'l-Ekrad* girîngiye xwe ya taybet heye.

Çawa di beşa “Di Edebiyata Kurdî de Fiqhnameyên Menzûm de” jî behsa wê derbas bû, tarîxa nivîsîna menzûmeyên serbixwe yên fiqhî ewqas zêde ne kevin e. Bi qasî ku hatiye tesbîtkirin, di serdema mîrekiyên Kurdan de di vî warî de tu berhem nehatine nivîsîn û ji bo derketina berhemên di vî warî de pêwîst e em li hêviya sed sala XXem bimînin. Di vî warî de berhema yekem jî, *Sefîna Kurdan* a Mela Ebdulcelîlê Botî ye. Bi vî awayî berhem di cureya fiqhnameyan de dibe nimûneya yekem û girîngiyeke mezin bi dest dixê.

Sedemê Nivîsîna Berhemê

Nivîskar di beşa destpêkê ya berhema xwe de bi zelalî sedemê nivîsîna berhemê îfade kiriye ku ev yek taybetiyeke kevneşopîya mesnewîyan e. Lêbelê balkêş e ku nivîskar bi awayekî serkeftî, sedemê nivîsîna berhema xwe di navê berhemê de jî bi cih kiriye. Bi rastî jî di berhemê de berî her tiştî navê wê balê dikişîne. Nivîskar bereksê kevneşopiyê, ne bi erebî tenê, bi erebî (*Rîsaletû Sefînetu'l-Ekrad Îla Sebîli'r-Reşad*) û kurdî (*Sefîna Kurdan Ji bo Ehlê Bajar û Gundan*) nav li berhema xwe kiriye. Her du navên berhemê jî bi sec' in û heman wateyê îfade dikin. Nivîskar berhema xwe şibandiye keştiyeke ku insan bi wê xilas bibin. Li gorî vê çawa ku keştî li ser behrê xelkê ji ketina avê xilas dike, bi heman rengî ev berhem jî xelkê ji nezanîne xilas dike:

1/22 *Sefîne* me nav danî lê ew çi ra?
Ji bo hindê eħbab û yar û bira

1/23 Li ser vê sefîne kesê bit siwar
Ew ê dê ji cehlê xelas kit bigar

Li gorî nivîskar ew kesên ku dê li keştiyê siwar bibin û ji nezanîne xelas bibin kurd in. Ev yek hem jî navê berhemê (*Sefînetu'l-Ekrad / Sefîna Kurdan*), hem jî ji çend beytên beşa destpêkê tê fêmkirin:

1/13 Bi kurdî bibêjim ji bo cinsê kurd
Di nêv cinsê xeyr da bibin serbilind

1/14 Xelas hem bibin da ji cewr û cefa
Kesê ku bixwînit bi zewq û sefa

1/15 Çî go sehl e mefhûm e kurmancî ye
Ji teb'a gelek zêde muhtac nîye

1/21 Ji lew min teleb kir nezim kim bigar
Ji bo cumle kurdan bikim yadigar

Guman tune ye ku nivîskarê me wek bi hezaran zanayên dînî dikarîbû berhemên xwe bi erebî binivîse û navê kurdan jî qet bi kar neîne. Lêbelê wî ev ne kiriye û di warê nivîsîna berhemên fiqhê de rêyeke nû şopandiye. Aşkera ye ku nivîsîna berhemê bi zimanê kurdî girîngîdayîna wî ya bi zimanê kurdî baş îfade dike. Li gorî van beytan du sedemên nivîsîna vê berhemê hene: Ji bo ku kurd di nav milletên din de pê serbilind bibin û ji bo ku hêsantir jê fêhm bikin. Yanî nivîskar berhema xwe bi taybetî ji bo kurdan nivîsiye û xwestiye bi vê berhemê xizmetekê ji kurdan re bike. Bikaranîna peyva “kurd” di navê berhemê de jî, girîngîdayîna wî ya bi kurdan dupat dike. Dikare bê gotin ku danîna navekî wisa ji bo berhemeke dînî gelekî balkêş e. Du sedem hene: Ya yekem ji Xanî heta bi Şêx Ebdurehmanê Aqteqî ji aliyê helbestvanên berê ve girîngîdayîna bi zimanê kurdî. Ya duyem jî reaksiyona wî ya ji bo zextên Komara Tirkiyeyê li ser kurdan.

Ruxsar

Berhem ji aliyê yekeyên nezmê ve li ser esasê beytan hatiye nezimkirin. Di berhemê de bi tevahî 511 beyt cih digirin. Berhem ji vî aliyê ve dikeve kategoriya berhemên navîn. Berhem ji aliyê teşeyên nezmê û sîstema qafiyeyê ve bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsîn. Hemû beytên wê di nav xwe de hemqafiye ne. Şemaya qafiyeya wê bi şêweya aa, bb, cc... ye. Menzûme bi mebesta ku bi hêsanî bê xwendin û jiberkîrin bi kêşa erûzê ji behra muteqarîbê li ser qalibê “fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl” hatiye nivîsîn ku ev qalib gelekî rewan e û di edebiyata kurdî ya klasîk de gelek ji menzûmeyên dînî-dîdaktîk bi vê kêşê hatine nivîsîn.

Ziman û Şêwaz

Dema ku meriv li berhemê dinêre bi hêsanî tê dîtîn ku helbestvan bi giştî xwedî îfadeyeke sade û herikbar e. Di hin ciyan de zehmetî kişandibe jî hakimî weznê ye. Derheqê helbestvaniya wî de ji bo bibe pîvan, ji ber ku ji xeynî vê berhemê tu helbestên/berhemên wî di destê me de nînin meriv nikare bêje ku Mele ‘Ebdulcelîlê Botî helbestvanekî serkeftiye an na. Lê belê digel her tiştî, Mele Ebdulcelîl ji ber ku mijarên zehmet û girîft ên fiqhê bi hostatî rijandiye qalibê helbestê, ev yek wek diyarde, şiyar û qudreta helbestvaniya wî nîşanî me dide.

Di vegotina mijaran de şêwazek sade hatiye bikaranîn. Di hin ciyan de nivîskar ji bo vegotineke rehet pêk bîne uslûbeke sohbetê tercîh kiriye. Ji ber ku berhem di mijarên fiqhê de hatiye nivîsîn, bivênevê zimanek spesîfîk yê dînî hatiye bikaranîn. Lê digel vê yekê jî berhem bi zimanekî sade û herikbar hatiye nivîsîn. Ji vî aliyê ve ev berhem ji bo zimanê kurdî çavkaniyek dewlemend e.

Tertîb

Tertîba *Sefînetu’l-Ekrad* a Mele Ebdulcelîl li gorî sîstema klasîk a mesnewiyar hatiye sazîkirin. Di vê çarçoveyê de berhem ji destpêk, mijara sereke û encamê pêk tê. Di destpêkê de ku ji 32 beytan pêk tê, pêşî ji bo ku me ji ummeta Îslamê afirandiye bi hemd û spasên Xweda Te’ala dest pê kiriye. Piştî wê, pesnê Cenabê Pêxember, malbat û eshab û peyrevên (tabî’in) wî daye. Pey wê re jî li ser sebebê nivîsîna berhemê hatiye rawestan ku li jorê behsa wê hat kirin. Beşa mijara sereke ku ji 475 beytan pêk tê, ji 6 “Kitab” û 26 “Bab” û 14 “Fesl”an pêk tê. Kîtab mijarên sereke, bab hin temayên di bin wê mijarê de, fesl jî hin mijarên ku di bin wan temayan de îfade dikin. Di sere her kîtab û baban de sernavên ku bi

erebî hatiye nivîsîn cih digirin. Di berhemê de beşeke serbixwe ya xatûmeyên tune. Nivîskar du çar beytên dawî de berhem bi dawî aniyê. Di dawîya menzûmeyê de, ji bo derfetek bi vî rengî xistiye destê wî hemd û spasîyên xwe ji bo Xudayê mezin teqdîm dike û xwe dispêre beşîşandina Xwedê Te'ala û şefaeta cenabê Pêxember.

Naverok

Naveroka berhemê ji mijarên fiqhê pêk tê. Lêbelê divê bê zanîn ku berhem li gorî fiqha mezhebê Îmamê Şafî'î hatiye tedwînkirin. Piştî van beytan nivîskar dest bi mijaran dike. Bi rêzê ji mijara teheretê dest pê dike, di her beşekê ku ji "Kîtab"ekê pêk tê; "Kîtabu't-Teharet", "Kîtabu's-Salat", "Kîtabu'l-Cenaiz", "Kîtabu'z-Zekat", "Kîtabu's-Siyam" û hetta "Kîtabu'l-Hecc"ê hemî mijarên sereke yê fiqhê digel mijarên hurgilî ku ji "bab" û "fesl"an pêk tên di navbera van sermijaran de bi ziman û şêwazeke fesîh û sade nezm kiriye.

Kitabu't-Tehareh:

Babu'n-Necaseh	: 15 malik
Feslun Fî's-Siwak	: 3 malik
Babu'l-Ewanî	: 2 malik
Babu Furudi'l-Wudu'	: 9 malik
Babu'l-Mesh 'Ela Xufeyn	: 9 malik
Babu'l-Istinca	: 10 malik
Babu Newaqidi'l-Wudu'	: 6
Babu Mûcibati'l-ğusl	: 5
Babu Furudi'l-ğusl	: 5
Babu İğsalu'l-Mesnuneh	: 10
Babu't-Teyemmum	: 16
Babu'l-Heyz	: 11 malik
Babu ma Yuhrem 'ela el-Muħdis	: 7 malik

Kitabu's-Selah

Feslun-fi zikri'n-Newafil	: 10
Babu Şuruti's-Selah	: 4
Babu Erkani's-Selah	: 8 malik
Feslun fi Eb'adi's-Selah we Hey'atiha	: 19 malik
Feslun fi Mubtilati's-Selah	: 5 malik
Babu Sucûdi's-Sehw	: 8 malik

Feslun fî Ewqati'l-letî Tukrehu fihe's-Selah	: 8 malik
Babu Selati'l-Cumu'eh	: 18 malik
Babu's-Selati'l-Musafir	: 7 malik
Babu Selati'l-Cumu'eh	: 20
Babu Selati'l-îdeyn	: 13
Babu Selati'l-Kusufeyn	: 6
Babu Selati'l-İstisqa	: 14 malik
Babu Selati'l-Xewf	: 17 malik
Feslun	: 6
Kitabu'l-Cenaiz	: 15 malik
Feslun fî hüşli'l-Meyyit we tekfînih we's-selatu 'Eleyh	: 21 malik
Kitabu'z-Zekah	: 23 malik
Feslun fî Zekati'l-Beqer we'l-genem	: 9 malik
Feslun fî'l-Xelteh we Şurûtiha	: 3 malik
Feslun fî Zekati'z-Zuru'	: 7 malik
Babu Zekati'n-Neqdeyn	: 11 malik
Babu Zekati'l-Fitr	: 8 malik
Feslun fî men Tusrefu İleyhimu'z-Zekah	: 9 malik
Kitabu's-Siyam	: 7 malik
Feslun fî Mûcibi'l-Keffareh we'l-Fidyeh	: 14 malik
Babu I'tikaf	: 6 malik
Kitabu'l-Hecc	: 10 malik
Babu Muherramati'l-İhram	: 12 malik
Feslun fî Eqsami'd-Dîma'	: 31 malik

Metnê Fiqihnameyê

6. 1. Nusxeyên Destxetê

Nusxeya N1 (Nusxeya Muellif)

Li ber destê me du nusxeyên destxet ên vê berhemê hene. Yek ji van nusxeya muellif e. Ev nusxe, li Mêrdînê heta sala 1994an di destê Mele Mehdîyê xwarziyê Mele Ebdulcelîl de bûye. Piştî wefata Mele Mehdî, zarokên wî, destxetê teslîmî Mele Mihemed Elîyê Şêxkirî dikin. (1995) Piştî ku bi rêya kurê Mele Mihemed Elî, Tahir Kurt agahiya me

ji vê destxetê çêbû, min latînzekirina vê destxetê wek spartek da M. Tahir Kurt. Destxet, îro di pirtukxaneyê me ya taybet de ye.

Destxet, ji “6 Kitab”, “24 bab” û “14 Fesl”an pêktê. Berhem bi tevayî 23 wereq in. Eger her du berg jî bîn hesibandin dike 25. Destxeta ku ji 511 beytan teşkîl dibe, di sala 1367/1951ê de bi xetê muellif Mele Ebdulcelîl hatiye nivîsîn. Ev yek ji qeyda temmetê tê famkirin: “Qed temme te’lifu hazihî’-Rîsalete ‘ela yedi’l feqîrî’z-zelîl ‘Ebdu’l-Celîl fî xelet min şehî Rebî’ûlaxer senete 1367.” Yanî “Nivîsîna vê rîsaleyê bi destê feqîr û zelîlê Ebdulcelîl di meha Rebbûlaxira sala 1367/1951an de hatiye temamkirin.” Li ser zahriyeya destxetê du qeydên temellukê yanî du qeydên ku xwediyê vê destxetê bûne hene. Yek ji van ev e: “Sahîbuhu we malîkuhu Muhemmed bin Mela Mustafa: Xwediyê vê berhemê Muhemmed kurê Mela Mustafa ye.” Ya din jî: “Sahîbuhu we malîkuhu Muhemmed Monla Ebdulcelîl bîn Mela Mustefa el merhûm: Xwediyê vê berhemê Muhemmed Mela Ebdulcelîl kurê mela Mustefayê merhûm... e.” Ebadên destxetê ji 185x135 mm. ye. Destxet li ser defterek dibistanê ya xêzdar hatiye nivîsîn û bi kartonê hatiye cildkirin. Di vê gotarê de emê vê nusxeyê wek N1 binav bikin.

Destpêk: Bi namê Xuda xaliqê ins û can
Digel hemdê bêhed di her hîn û an

Dawî: Bi ismê Xuda kir me bed’a kalam
Bi namê te ya Reb me kir ixtitam

Nusxeya N2

Nusxeya din jî di pirtukxaneyê me ya taybet de ye. Bi *Nehcu’l-Enam* a Mele Xelîlê Sêrtî re digel hev hatiye cildkirin. Di rûpela zahriyeyê de lewhayek grover ku tê de navê Xwedê, pêxember, çar xelîfe û Hesên û Husên heye. Herwiha di wereq 1a yê di nêviyê rupelê de şemseyek heye ku tê de *Nehcu’l-Enam* û besmele cî digre. Di rupelên vala de jî navê xwediyê destxetê “Bedrî Cennet” nivîsandiye. Li gor nimareyên ku ji aliyê me ve hatiye çêkirin *Nehcu’l-Enam* di nava vereqên 1a-27b yê de cî digre. *Sefînetu’l-Ekrad* di nava vereqên 28a-56a yê de cî digre. Ebadên nusxeya N2yê ji ber ku li ser defterek dibistanê ya xêzdar de bi N1ê re di heman ebadê de ye. Destxet ji aliyê kesekî bi navê Mela Zulfî hatiye nivîsîn. Jimara rêzan bi gelemperî di her rûpelê de 10 in. Bi xetteke bi hereke hatiye nivîsîn. Ev jî di xwendinê de sebeba hêsaniyê ye. Lêbelê xetê mustensîx li gor N1ê ne xweşik e. Rûpel hatine cedwelkirin. Di beşa *Nehcu’l-Enamê* de hew alîyekî rûpelê hatiye bikaranîn. Lê di qismê *Sefînetu’l-Ekradê* de her du aliyên rûpelan hatiye bikaranîn. Di qismê *Nehcu’l-Enamê* de peyva taqîbê heye, di *Sefînetu’l-Ekradê* de tune. Destpêk û dawîya N2yê mîna N1 ye. Qeyda ketebeyê di dawîya *Nehcu’l-Enamê* de di w. 27byê de piştî “temmet”ê bi vî şiklî cî digre: “Ketebe heqîr feqîr şahîb zenb kurê ‘Ebdurrezzaq el-muznîb ‘efwîke ya zu’l-celal el Mela Zulfî” Dîroka istînsaxa vê nusxeyê di dawîya Sefîneyê de wiha ye: “Temmet, 1365 1950”

6. 2. Rêbaza Amadekirina Metnê

Di amadekirina metne vê fiqhnameyê de xalên jêrîn li ber çavan hatin girtin.

1. Di nivîsîna metnê berhemê de N1 esas hat girtin. Lewra ji aliyê xweşnivîsî, peyv, kêş û wateyê ve N1 ji N2yê gelekî baştir bû. Lêbelê digel vê jî ferqên nusxe 2yê di aparatan de hatin nişandan. Di kêma cihan de ferqên N2yê esas hatin girtin û di gewdeya metnê de hatin bicihkirin.

2. Wereq li ku bi dawî hatibe, jimara wereqê li wir di nav parantêza bi koşe de hat nişandan. Wek [1a], [1b].

3. Ji bo sernavan jimare hatin dayîn û di bin wê de di serê beytan de jimareya wê sernavê û jimareya beytê bi hev re hatin nivîsîn. Çawa ku di nimûneya jêrîn de tê dîtin:

[40] **Babu Zekati'l-Fitr**

40/1 Ji megrîb şeva 'îdê fitrê bizan
Dibit fitre wacib li ser mu'minan

4. Metnê berhemê li gorî kêşa erûzê hat xwendin û di vê çarçoveyê de emeliyeyên jêrîn hatin kirin:

- Heceyên farisî yên ku ji sê herfan pêk tên û herfa wan a navîn dengdêrekî dirêj (a, î, û) e ji ber pêdiviya kêşa erûzê ne wek hêceyêke tenê, wek du hêceyan hatin xwedin (hêceya yekem dirêj, ya duyem kurt) û ji ber ku ne ji eslê peyvê ye hêceya duyem di nav parantêzê de hat nişandan. Wek;

1/5 Ji vê ummeta Eħmedê **nam(i)**dar
Li ser wî selat û selam sed hezar

- Di hêceyên zêde de di şuna herfa dengdêr de (‘) hat bikaranîn. Bi vî awayî kêş hat sererastkirin. Çawa ku di beytên jêrîn de di peyvên “sul’sek” û “j” de tê dîtin.

38/7 Welê wezna mudda bi wezna ‘Iraq
Bigir ritl û **sul’sek** tamam biêt-tîfaq

27/16 Welê **j**’ihtiyacê ziyade heman
Heçikê li paş wan betal her bizan

- Dengdêrên dirêj ku di wan de zihaf hatiye kirin, îtalîk hatin nişandan. Çawa ku di beyta jêrîn de di peyvên “‘îdê” û “‘ebdê” de tê dîtin.

40/1 Ji megrîb şeva ‘**îdê** fitrê bizan
Dibit fitre wacib li ser mu’eminan

1/31 Dibit kû kerem ket Xudayê cemîl
‘Efû ket evî ‘**ebdê** muznib zelîl

5. Di latînzekirinê de xalên jêrîn li ber çavan hatin girtin:

- Latînzekirina herfên erebî li gorî alfabeya transkrîpsiyonê ya standart hat kirin ku li jêrê lîsteya herfên erebî û muqabilên wan ên transkrîpsiyonê hatiye dayîn:

ث	: Ş ş	ط	: T t
ح	: H h	ظ	: Z z
ذ	: Z z	ع	: ‘
ص	: Ş ş	غ	: Ğ ğ
ض	: Z z	أ	: ’
ض	: D d		

- Kesre (◌ِ) bi “i”, û herfa “ى”ê (yê) jî bi “i” hat nişan dan. Mesela di beyta jêrîn de di peyva “tesfîq”ê de piştî herfa “f”yê “ى”ê û di peyva “xilafen” de piştî herfa “x”ê (◌ِ) heye. Ji ber ku “ى” û (◌ِ) ji hev cuda ne, divê nişaneyên wan jî ji hev cuda bin. Loma jî ya pêşî bi “i” û ya duyem jî bi “i” hatin nivîsîn.

21/4 Ji mêra re tesbîh iza nabehûm
Ji unsa re **tesfîq xilafen** lehûm

6. Hevokên bi erebî îtalîk hatin nivîsîn û di jêrenotê de jî wergera wan a kurmancî hat dayîn.

7. Tiştên ku ji aliyê me li metnê hatine zêdekirin di nav parantêza bi koşe de hatin nişandan. Wek [1. Destpêk], [1b].

7. Encam

Di pêkhatina edebiyata kurdî ya klasîk de bandora dîne Îslamê dîyarker e. Ev rewş ji bo edebiyatên gelên misilman ên rojhilatê tevan derbasdar e. Di edebiyatên klasîk ên rojhilatê de cureyên edebî bi giştî li ser cureyên edebî yê dînî û cureyên edebî yê beşerî-ladînî têne dabeşkirin. Di edebiyatên rojhilatê de, di cûreyên dînî de gelek berhemên menzûm hatine nivîsîn. Di nav berhemên bi zanistên dînî Îslamî re têkildar de, bi taybetî yê derheqê zanista eqaid (eqaidname) û zanista fiqhê (fiqhname) de gelekî derketine pêş û belav bûne. Berhemên menzûm yê bi vî rengî, di mijarên bingehîn yê dînî Îslamê de bi naverokeke xulasekirî, bi zimanekî sade û herikbar hatine nivîsîn. Herwekî erebî, farisî û tirkî bi zimanê kurdî jî komek berhem bi vî tarzê hatine nivîsîn. Di edebiyata kurdî de li ser esasên fiqhê û bi taybetî nimêjê gelek menzûme hatine nivîsîn. *Sefînetu’l-Ekrad a Mele ‘Ebdulcelîlê Botî* di edebiyata kurdî ya klasîk de yek ji van berhemên orjînal e ku bi cureya fiqhnameya menzûm hatiye nivîsîn. Berhem destxet e û 2 nusxeyên wê di destê me de ne. Nivîskarê wê, Mele ‘Ebdulcelîlê Botî bi her çiqas li herêma Surgiçan jiyabe jî, bi eslê xwe ji herêma Botan e. Koçî bajarê Şamê kiriye û di sala 1994an de li wê derê wefat kiriye.

Rîsaletû Sefînetu’l-Ekrad Îla Sebîlî’r-Reşad/Sefîna Kurdan Ji bo Ehlê Bajar û Gundan berhemeke girîng e ku Mela Ebdulcelîl di sala 1367/1951ê de nivîsiye û pêşkêşî pirtûkxaneyê Kurdî kiriye. Berhem, di cureya fiqhnameyan de di edebiyata kurdî de nimûneya yekem e û ji ber vê taybetmendiyê jî girîngiyeke mezin bi dest dixwe.

Sefînetu’l-Ekrad, mesnewîyek e û bi temamî ji 511 beytan pêk hatiye. Ji aliyê şewazê ve bi zimanekî sade û herikbar hatiye nivîsîn. Ji vî aliyê ve ev berhem ji bo zimanê kurdî çavkaniyek dewlemend e. Di vê çarçoveyê de metnê berhemê li gorî krîtîka metnê û nişandana ferqên her du nusxeyan, herweha di çarçoveya rêzikên erûzê de hate amadekirin. Bi rê û rêbazên zanistî weşandina berhemeke bi vî rengî, ji bo lêkolînên edebiyata kurdî dagirtina valahiyekê ye.

8. Metnê Transkrîbekirî:

Risaletu Sefînetu'l-Ekrad İla Sebîli'r-Reşad Sefîna Kurdan ji bo Ehlê Bajar û Gundan

Bismillahi'r-Rehmani'r-Rehîm
We bihî neste 'în fî umûri'd-dunya we'd-dîn

[1. Destpêk]

[1b]

- 1/1 Bi namê Xuda xaliqê ins û can
Digel hemdê bêhed di her hîn û an
- 1/2 Ji bo te mudawim bitin ey Xuda
Beyan kir te bo me terîqa huda
- 1/3 Temamê usûl û firû'ê di dîn
Ji bo me beyan kir di şer' a mubîn
- 1/4 Şukur bo te ya Reb di her sa'etê
Gerandin te em tev ji vê ummetê
- 1/5 Ji vê ummeta Ehedê nam(i)dar
Li ser wî selat û selam sed hezar
- 1/6 Wuhareng li ser al û şehban hemîn
Li ewlad û ezvac û hem tabi'în
- 1/7 Mukerrer muda'ef bitin her mudam
Nebit munqetiê ta bi yewmu'l-qiyam
- 1/8 We be' du were ey qelem bê henek
Me qesd e bi hev xim hinik reş belek

[2a]

- 1/9 Heçî hate qelbê me zû lê bi lez
Di emrê me da ser serê xwe bibeze

1/8 We be' du] Di be' du N2.

- 1/10 Nekî dilgiranî tu ey nurê 'eyn
Çiko ferd e ev hem welê ferdu 'eyn
- 1/11 Me qesd e nezim kim bi nezmek xefff
Çi eokamê lazim ji şer' a şerîf
- 1/12 Ji ebwabê fiqhê eya sami'î
Welakin ji fiqha İmam Şafi'î
- 1/13 Bi kurdî bibêjim ji bo cinsê kurd
Di nêv cinsê geyr da bibin serbilind
- 1/14 Xelas hem bibin da ji cewr û cefa
Kesê ku bixwînit bi zewq û sefa
- 1/15 Çiko sehl e mefhûm e kurmancî ye
Ji te' ba gelek zêde muhtac nîye
- 1/16 Hemî em dizanin xefî nîne hal
Kitabê di geyran divêt çend(i) sal
- 1/17 Mudawim bitin hem bi rûz û bi şeb
Bi se'ey û bi cehd û bi renc û te' eb
- 1/18 Heta kû hîfiz ket luget ew zeman
Dibit kû bizanit ji ilmê hinan
- 1/19 Welakin zemanê di me salekê
Kesê kû bixwîne welew carekê
- 1/20 Kû seyda bi wî re bi ders kit xitam
Dibit 'arifê wan umûran tamam
- [2b]**
- 1/21 Ji lew min teleb kir nezim kim bi gar
Ji bo cumle kurdan bikim yad(i)gar
- 1/22 *Sefîne* me nav danî lê ew çi ra?
Ji bo hindê eħbab û yar û bira

- 1/23 Li ser vê sefînê kesê bit siwar
Ew ê dê ji cehlê xelas kit bi gar
- 1/24 Rica min ji xaliq heye her mudam
Bixit tê da nef'ê welê nef'ê 'am
- 1/25 Bigîrî ji bo wechê xwe her nefes
Tu se'ya feqîrî negîrî 'ebes
- 1/26 Wuhareng umîd e ji her qari'an
Çi ustad û tilmîz û hem sami'an
- 1/27 Bikin geddê çeşman ji 'eyb û qusûr
Çikû nîne xalî ji neqs û futûr
- 1/28 Murûr kin wekî wan kiramin himam
*Îza merrû bi'l-leğwî merrû kiram*¹¹
- 1/29 Wuhareng ji bo min bibin destegîr
Di wextê du'an qet nekin min ji bîr
- 1/30 Me bê par nehêlin ji wan ed' iyan
Gelek bargiran im ji naqenciyan
- 1/31 Dibit kû kerem ket Xudayê cemîl
'Efû ket evî 'ebdê muznib zelîl
- 1/32 Ji bîr qet nekin me j' du'ên salihê
Ji bo da û baban jî el-fatihe

[3a]

[2.] (Kitabu't-Tehareh)

- 2/1 Bizan heft(i) av in di pak û tehûr
Munecces bi van tahir in bê qusûr
- 2/2 Ev in ava esman û 'eyn û bihar
Digel berf û nehr û terez hem biyar

¹¹ "Dema tişteki kirêt û şaş dibinin, bi ciwanmêrî tevdigerin." (Sureya Furqan Ayeta 72.)

- 2/3 Dibên mutleq av jê ra ehlê ‘ulûm
Kû xalî bitin ew ji qeydê luzûm
- 2/4 We hem sê qisim dî hene tu bizan
Ji wan yek ev e ava tahir ‘eyan
- 2/5 We geyrî şehûr e bizan wî bira
Ji bo te beyan kim hemî eşkera
- 2/6 Ew e her çî ava ku tevlê bitin
Çî eşyayê ûahir mukedder bitin
- 2/7 Wuhareng e ava kû pê bit èemel
Di destmêja ferz zanibe bê zelel
- 2/8 Welê qismê sanî ji avên zelal
Bizan qismê mekrûh e ey zî cemal
- 2/9 Tu mekrûh bigîre muheqqeq ewî
Çî ava li ber tavê germ bit qewî
- 2/10 Dîger qismê salis necis wî bizan
Necaset ku têk lê bitin bê guman
- 2/11 Ev e hukm e ger av kû kêmîr bitin
Ji dû qulliyana la kû ekser bitin
- 2/12 Ji dû qulliyana ger ku purtir hebit
Necis nabitin ta muğeyyer nebit
- 2/13 Bi teqrîb(i) ritlê ewan pansed in
Bi ertalê Begdayê şek tê nebin
- [3] (Babu ‘n-Necaseh)**
- 3/1 Necaset dibit sê qisim geh tu seyr
Gêlîz e xeffî e weset leyse àeyr
- 3/2 Xeffî ê biçûkê berî xwardinê
gêlîz ê di xenzîr û kelbê dinê

- 3/3 Heçî mabeqa tu bizane weset
Tu qenc seh ke tê da nebête gelet
- 3/4 Bi reşşê dibit pak û tahir xeffîf
Bi ceryanê wusta dibêtin nezîf
- 3/5 Dibit pak û tahir bizan ey weled
Ku ‘eynê necaset nemînit ebed
- 3/6 gelîze dibit pak(i) ey mustefîd
Bi heft ava yek jê digel bit şe‘îd
- 3/7 Ji ber xwe dema bibte sirke xemîr
Çi xemra tîrîh bit çi bit ya temir
- 3/8 Dibit pak û tahir bizan wê demê
Menafi‘ dibêtin ji bo ‘alemê
- 3/9 Necaset bi heylûletê nûrebîn
Dibit pak welê wî munecces bibîn
- 3/10 Cilûdê miraran kû bibte debağ
Di hingam dibit ûahir û malê şağ
- 3/11 Ji geyr cildê xenzîr û kelbê bizan
Qe pak nabitin ew di dewr û zeman
- 3/12 Hemî hey muheqqeq tu tahir bizan
Ji geyr kûçik û weşş û fer‘ê di wan
- 3/13 Welî meytetan tev necis wan bibîn
Ji geyr kullî û masî însan yeqîn
- 3/14 Hemî tiştê bain bitin ew ji hey
Wekî meyteta wî bizan bit çi şey
- 3/15 Ji geyr âûf û webr û per û mû digel
Bizan qenc ku ew ûahir in bê xelet

[4a]

3/11 kûçik û weşş] kelb û xenzîr N2

3/13 kullî û masî însan yeqîn] ins û masî cerad ey emîn N2

[4] (Feşlun fi's-Siwak)

4/1 Siwak musteheb e di her weqt û hîn
Di hîna nimêjan şedîttir bibîn

4/2 Wuhareng ji xabê dema rabin
Wekî dev ji ezmê muğeyyer bitin

4/3 Ne mekrûh e qet ew di yek oîn û oal
Ji geyr saimî ew jî be' de 'z-zewal

[5] (Babu 'l-Ewanî)

5/1 Cemî'ê firaqa tu caiz bidêr
Di isti' malê da ji geyr zîv û zêr

5/2 Digel ittixaza ewan her duwan
Bigîre heram pak hîfiz ke ewan

[6] (Babu Furuđu'l-Wuđu')

6/1 Ji destmêjê ra şeş feraid bizan
Li nik gêsla wechê niyet yek ji wan

6/2 Duwan şuştina rû bigir dûne meyn
Siyan gêsla destan me' el mirfeqeyn

6/3 Çihar mesha ser hem mesih ke li pê
Tu xamis bizan şuştina her du pê

6/4 We tertîba ruknan bigir ya şeşan
Heçî mabeqa musteheb wan bizan

6/5 Ew in deh tamam èed ke wan cumle tev
Ku yek tasmîye şuştina her dû kef

[4b]

6/6 Digel meçmede pûz(i) şuştin heman
Bi hev re cemi' ke ewan her wusan

6/7 Bi carik mesiḥ ke cemî'ê di ser
Digel her du guh baṭin û ma zehar

6/8 Tu texlîl(i) ke li liḥyeyê lê bizan
Ku kuse bitin hem digel esbû'an

6/9 Muqeddem yemînî bike her li çep
Muşelleş li pey hev biger ba edeb

[7] Babu 'l-Meşî' ele 'l-Xuffeyn

7/1 Tu meşḥa xufeyna bizan bê zeled
Durust in li nik çar şurûtan digel

7/2 Gerek libsê kit piştî tûhra tamam
Cihê ferê setir ket welê setrê'am

7/3 Divêt pak û à ahir bitin hem bizan
Ku meşya tetabu' bibêtin bi wan

7/4 Muqîm muddetê meşê yek rûz û şeb
Misafir sisê ne bizan ma weceb

7/5 Di paş meşê her çî biçit der sefer
We bil'eksê ew her wekî men heḍer

7/6 Hedes îbtîda muddeta ne heman
Welê hedgesa piştî lebsê bizan

7/7 Bizane ji bo meşê hin mubṭilat
Hene qenc hîfîz ke wuha bo me hat

[5a]

7/8 Yekî inqîêa muddetê ya duwan
Bi derkefte ger xif ji ling û piyan

7/9 Wuhareng çî mûcib bitin bê guman
Ji bo şuştina pê tu mubṭil bizan

[8] (Babu 'l-İstincaî)

- 8/1 Çi xaric ji paş û ji pêş ezbenî
Necis wan bizanî ji geyrê menî
- 8/2 Ji wan pakkirin wacib e zû eger
Bi avê weyaxud bi sê qet'e ber
- 8/3 Welakin berê ger cemi' kin bi av
Gelek efdeliyye heye bê xilaf
- 8/4 Weger iqtisar kin bi ava zelal
Ji ber çêtir e tu bizan bê meqal
- 8/5 Dema hacetê xwe hîfız ke mudam
Ji piştan û berdana beyti'l-heram
- 8/6 Hêram e li çolê dixwazit edeb
Di mal da tecennubkirin musteheb
- 8/7 Li roj û heyîvê muqabil nebî
Ji bin dara fêkî qewî dûr(i)bî
- 8/8 Ji zîll û terîqan ji eçarê kûr
Ji ava necarî bi dûr kev bi dûr
- 8/9 Kelam û 'ebeş terk(i) ke ya uxey
Li nik xwe nehêle ji zîkrê tu şey
- 8/10 Cihê xwe bedel ke tu qenc guh bidêr
Di cih da bi avê tîharet negir
- [5b]**
[9] (Babu Newaqîdu'l-Wuđû')
- 9/1 Ji her dû sebîlan çî derkev heman
Ji geyrî menî wan newaqîê bizan
- 9/2 Wuhareng xewa xeyrî temkîn(i) bit
Çî tiştê ku 'eqlê leñîf pê biçit
- 9/3 Bi betnê yedan ku bitin messê ferc
Digel lemsê namehrema bizane qenc

- 9/4 Welê ku bitin lems bila haile
We ger ne neqiê nîne bê gaile
- 9/5 Keza ger şegîre bitin wê demê
Digel zûfr û por û diranan hemê
- 9/6 Neqiê nîne bê şik ji dil guh bidêr
Hîfîz ke ewan cumleşan şubhê şêr

[10] (Babu Mûcibatu'l-ğusl)

- 10/1 Şeş in mûcibê gûslê ey nûrebîn
Ji dil guh bidê qenc hîfîz ke yeqîn
- 10/2 Dema iltîqa bibne her dû xitan
Bizan mûcibê gûslê ev yek ji wan
- 10/3 Wuhareng menî ger bibîtin xurûc
Eger çend(i) xaric bitin bê wulûc
- 10/4 Mirin jî wekî wan e tev mûcib in
Di van de şerîk in hemî mêr û jin
- 10/5 Sisê din hene ew ji xasê jinan
Nîfas û wilade digel heydê wan

[6a]

[11] (Babu Furuđu'l-ğusl)

- 11/1 Furûdê di gûslê niyet yek ji wan
Digel gûsla 'eynê necaset bizan
- 11/2 We hem bit bi avê beden 'amkirin
Digel şe'r û mûyan heta kokê bin
- 11/3 Bigir pêşî gûslê wudûek tamam
Bi ismê Xuda xaliqê layenam
- 11/4 Yemînê muqeddem bike ser şimal
Bi teşlîş û tedlîk wila' bê cidal
- 11/5 Di wê gav dixwazit heya û edeb

Ev in ê ji bo şuştinê musteheb

[12] (Babu Îğsalu'l-Mesnûneh)

- 12/1 Were qenc temaşa ke bo şuştinê
Welê gûslê sunnet ji dil guhdinê
- 12/2 Hemî gûslê sunnet bizane ev in
Temamê di wan bi 'l' eded hişdeh in
- 12/3 Ji bo her du 'îd hem xusûf û kusûf
Digel cum' eê da cemi' bin şufûf
- 12/4 Wuhareng li ser qaşidê 'stisqaê
Digel kafirî bînitin şehdeê
- 12/5 Li ser gâsilê meyyitan jî wusan
Digel dîn û muğma ' eleyhi bizan

[6b]

- 12/6 Çi weqta vegerya ji bo wan êeqil
Di wê gav ji wan re dixwazit gûsil
- 12/7 Kesê ku telepkarê ihramê hem
Li ser daxilê Mekkeha muhterem
- 12/8 Wuhareng li ser waqifê ' erefê
Digel wê mebîta li Muzdelîfê
- 12/9 Sisê dî li ehlê Minayê tamam
Hemî roj li ser taîfîna mudam
- 12/10 Dîger bo dixûla Medîna hebîb
Bigîr wî ji bo me şefîe ya mucîb

[13] (Babû 't-Teyemmum)

- 13/1 Teyemmum durust e bizan bê xilaf
Ji bo rêwîyan her li nik feqdê av
- 13/2 Ziyade bitin ger li avê derer

Tu caiz bidêre welew der heçer

13/3 Dixwazit dema ûaetê bit duxûl
Digel telbeya maê an dem qebûl

13/4 Ji paş telbeê ger ewî av nedî
Di wê gav li axê bila bit xwedî

13/5 Divêtin teyemmum bi axek temîz
Bi geyr xwe nebit mumtezic ey 'ezîz

[7a]

13/6 Feraiz çihar in bizane ewan
Niyet hem digel mesha wech û yedan

13/7 Bi dû derbetan wan mesih ke mudam
Tu tertîbê 'ed ke dibêtin tamam

13/8 Bizan sunnet e tesmiya namê Reb
Yemînê muqeddem bike her li çep

13/9 Muwalat wuhareng e meqlûbe xwaz
Tu mubtil bizan irtidat el-'iyaz

13/10 We hem dîtina ma di enhar û cû
Digel her çi mubûil bitin pê wuqû'

13/11 Kesê ku cebîre hebêtin digel
Teyemmum ji wî ra dixwazit bedel

13/12 Divêtin bi avê ewê mesh(i) kit
Şehîhê bi carek hemî gesl(i) kit

13/13 Di cismê cebîre li ku bit bizan
Qeşa nîne illa di wech û yedan

13/14 We hem ku weqî' kit li hâlê heçer
Dixwazit qeşa wî demê bê 'ebes

13/15 Teyemmum dixwazit ji bo kullê ferd
Ji geyn ferdekî nabitin pê ebed

13/16 Welê pê dibit ferê û sunnet delal
Newafil çi qas pir bitin ey heval

[7b]

[14] (Babu 'l-Heyz)

14/1 Dimaê ku têtin ji hindê jinan
Nifas û istiḥāze digel heyzê wan

14/2 Tu te' rîfê heyzê cibille binas
Wekî piştê weḍ'ê bizanit nifas

14/3 Ji geyr her du wan istiḥāze bizan
Riyāze dixwazit ji bo fehmê wan

14/4 Çi xwîna ku bêtin berî neh sinîn
Bizan istiḥāze ewê her yeqîn

14/5 Ji heyzê ra edna şev û roj bigir
We ekşer ji yanzde nehin zêdetir

14/6 Tu ğalib şeşan ya neh hefta bibîn
Welê sinnê heyzê bizan neh sinîn

14/7 Ji tuhrê ra yazde bizane eqel
Ji eqşayê ra nîne hed la tesel

14/8 Eqellê nifasê bizan leḥzeyek
We ekşer bizan şêst e xuz yek bi yek

14/9 Wuhareng e eġleb bigir erbe'în
Tu hukman ji geyr vê ji nik xwe mebîn

14/10 Ji ḥemlê ya edna qeder nişfe 'am
Welê ekşerê wê çihar şal tamam

14/11 We eġlebuhû neh meh in cumle tev

14/2 Tu te' rîfê heyzê cibille binas] heçî heyz ewê her cibille binas N2

14/8 We ekâer bizan şêst e xuð yek bi yek] pîrrê wî bizan şêst e ey tu bibîn N2

14/9 Wuhareng e eġleb bigir erbe'în] We ğalib bigir çil tamam bê óenek N2

Tu ‘ilmê teşeb ke ji cehlê birev

[8a]

[15] **Babu ma Yeħrumu ‘ele’l-Muħdes**

15/1 Xisalê muħerrem li ser ħaiẓan
Tewaf û nimêj dest li qur’anê dan

15/2 Digel xwendina wî kelimê qedîm
Nebit ku ewî qesda zikrê hekîm

15/3 Wuħareng e sekna hemî mescidan
Siyam û cîmaê hem telaêub bi wan

15/4 Tela‘ub di mabeynê çogan û nav
Ku hail nebêtin di ew weqt û gav

15/5 Berî ğuslê sewmê tu caiz bidêr
Li paş şuştinê ê dimayî bigîr

15/6 Ji ğeyr sêkê paşî cemî‘ en tamam
Li ser mucnibê wan bigêre heram

15/7 Cemî‘ê xisalan helal wan bizan
Ji ğeyr her sê ewwel li ser muħdisan

[16] **Kîtabu’s-Selah**

16/1 Nimêjên di ferz cumle pênc in yeqîn
Xuda ferz(i) kirne li ser ‘alemîn

16/2 Zewal wextê nîvrojê bigre ewê
We axir siha şey bitin mislê wê

16/3 Ji mislê eger sih bibit zêdetir
Dibit ewwelê weqtê ferda êesir

16/4 Eger sih bibit qasî şey’ê du car
Ewî her bigir weqtekî ixtiyar

16/5 Dimînit heta roj biçit der gurûb
Ji meğrib ra weqt e tamamê gurûb

16/6 Wuhareng e meğrib dimînit heta
Bibêtin ‘edem sor şefeş ya feta

16/7 Di wê gav dibêtin ‘ışa’ her bizan
Nihayet heta fecrê sadiq èeyan

16/8 Dema fecrê sadiq bibêtin zuhûr
Ji bo subhê weqt e bizan bê qusûr

16/9 Ji hingam dikêşit heta rojhilat
Ji wir pê ve ew ferd dibêtin fewat

[17] **Feslun Fî Zîkrî’n-Newafilî**

17/1 Nimêj lazim e ser cemî‘ i di nas
Mukellef mutehher ji heyd û nîfas

17/2 Li ser ewliyan piştî heft sal dixwaz
Biçûkan emir kin ji bona nemaz

17/3 Dema ku bitin ‘umrê wan deh tamam
Ji bo terkê lêdan dixwazit mudam

17/4 Nefil çend(i) qism in welê pênc ji wan
Di wan de cema‘ et tu meşrû‘ bizan

17/5 Yek istisqa e ya duwan e kusûf
Digel her dû ‘îdan wuhareng xusûf

17/6 Cema‘ et di ê mabeqa de neh in
Jimara di wan cumleşan huvdeh in

17/7 Berî ferda fecrê du rek‘ et bizan
Çihar in ji pêş ferda zuhrê heman

17/8 Du rek‘ et hene paşî wê jî yeqîn
Berî ferda ‘esrê çihar in bibîn

17/9 Ji paş ferda meğrib bigir isnetan
‘Işa jî wekî wê hifiz ke ewan

17/10 We hem rek‘etek witr e lê ew eqel
Teheccud duha hem terawîh digel

[18] Babu Şurûti’s-Selah

18/1 Şurûtê nimêjan çihar in bizan
Beden pakkirin hem libas û mekan

18/2 Setirkirna ‘ewret divêtin bitin
Eger çend(i) tarî yû xalî bitin

18/3 Wuhareng e zanîn bi bûna demê
Berêdan ji bo qibleya èalemê

18/4 Bizan terkê qiblê di neflê sefer
Digel xewfa zêde ji hed yuxtefer

[19] Babu Erkani’s-Selah

19/1 Nimêj tê hene çend(i) erkan dexî
Ji wan re divêt èilm û zanîn exî

19/2 Niyet yek we hem lefzê tekbîrê bel
Qiyam jî ku qudret hebêtin digel

19/3 We hem fathe xwendin bi ismê celal
Rukû‘ û teme’nîn û hem i‘tidal

19/4 Teme’nîn li hir jî digel secdeê
Kezake teme’nîn digel celseê

19/5 Teme’nîn û hem secdeya dî wusan
Ewan her duwan ‘ed ke ruknek tevan

19/6 Hemî rek‘etê dî welê wan bibîn
Ji geyr niyyet û lefzê tekbîrê nîn

19/7 Culûsa exîr hem teşehhud digel
Bixûne selat her li şahê milel

19/8 Wuhareng e tertîb divê heyêetê
Selam hem di yek qîl xurûc niyyetê

[20] Feslun Fî Ebâdi's-Selah we Hey'atiha

20/1 Di ber ferdê du sunnet in musteheb
Di nêv da du eb' ad hene bel eheb

20/2 Yekî pêş iqamet we ya dî ezan
Yekî nêv teşehhud qunût ya duwan

20/3 Di nava nimêjan hene çend xisal
Ku hey'et ji wan re dibên der meqal

20/4 Li nik niyyetê ref' a her du yedan
Rukû' i' tidal hem li nik wan wusan

20/5 Wuhareng ji paş ku tehiyyat(i) xwend
Divêt rabbitin lê dema bû bilend

20/6 Wedi' ket yemînê li ser ê çepê
Teweccuh te' ewwuz bixwîn her li pê

20/7 Qiraet di nîvroj û ' esrê bi xef
Di ê mabeqa eşkera cumle tev

20/8 Bi te'mîn û tekbîr di her intiçal
Wuhareng e tesmî' (i) der i' tidal

20/9 Munezzeh ke mewla bi tesbîh(i)dan
Di hîna rukû' û sucûda tevan

20/10 Di kullê culûsan de kit iftiraş
Tewerruk di wê celseya her li paş

20/11 Tu destê yemînê bigir ey delal
Ji geyr şehdeê lê fetih ke şimal

20/12 Wuhareng selata li alê nebî

20/8 Bi te'mîn û tekbîr] we te'mîn jî tekbîr N2

20/10 Di kullê cilûsan de kit] Di celsa ewwil da bizan N2

Selama duwan jî bizan her we bî

[21] Feslun

- 21/1 Hinik şey hene mêr xilafê jinan
Enîşk dûrkin her ji nik caniban
- 21/2 Di halê rukûê û sucûdan ewî
We hem zikbilindbûn ji fezzên di wî
- 21/3 Tilawet ciharen dema roj nebî
Welê jin bi sir ku bitin ecnebî
- 21/4 Ji mêra re tesbîh *iza nabehûm*¹²
Ji unsa re tesfîq xilafen lehûm
- 21/5 Ji mêra re ewret ev in bê gelet
Ji mabeynê çog û hinavan feqet
- 21/6 Temamê jinên hur tu ewret bibîn
Ji geyr wech û destan ji nêv wan derîn
- 21/7 Welê ger reqîqe bitin jin bizan
Di ewret wekî mêr e ew bê guman

[10b]

[22] Feslun Fî Mubtilati's-Selah

- 22/1 Ji bona nimêjan hene mubtilat
Tu guh de li te da nebitin fewat
- 22/2 Ji qesdî xeberdan û ew reng girîn
Ku peyda bitin du hurûf hem kenîn
- 22/3 Li pey hev ji efêalê pur hem hedes
Necaset liqabûn welê *in mekes*¹³
- 22/4 Vexwarin digel xwarin û riddetê

20/12 Wuhareng] Digel wê N2

¹² Dema talokeyek li wan biqewime.

¹³ Eger li ser bimîne.

Wuhareng e keşfa ji bo 'ewretê

22/4 Texeyyûr ku bêt niyetê wî bizan
Digel terka qibla hemî mu'minan

[23] Babu Sucûdi's-Sehw

23/1 Çi e' alê mubtil bitin ' emdê wî
Betal nakitin tu bizan sehwê wî

23/2 Welê secde sehwê divêtin digel
Cebir da bikit ew şukûkê xelex

23/3 Eger terk(i) kit ew ji hindê xisal
Dibit vê qisim qenc hifiz ke meqal

23/4 Ku metrûk(i) ferd bit bizane ewî
Cebir nîne jê ra ji geyr fi' lê wî

23/5 Welê ger ku be' d bit veger jê re nîn
Divêt secdeya sehwê bo wî yeqîn

23/6 Ku hey'et bitin jê re nîne tu şey
Ne fi' l û ne secde bike şukrê Hey

[11a]

23/7 Kesê şik kevit *ye'etemîd li 'l-yeqîn*¹⁴
Di piştî bînaê sucûd jê re dîn

23/8 Sucûdê di sehwê bizan du *tuqam*¹⁵
Li nik axirê lê qubeyli 's-selam

[24] Feslun Fi'l-Ewqati'l-Letî Tukrehu Fîhe's-Selah

24/1 Cemî'ê nimêjên bitin bê sebab
Di pênc weqtê ha tu bizan *yucteneb*¹⁶

23/2 Cebir da bikit ew şukûkê xelex] xeber da bikit ew cemî'ê xelex N2

¹⁴ Dilê wî li ser çî yeqîn bike, dê li gorî wê hereket bike.

¹⁵ (Secda sehwê) dê bê kirin.

¹⁶ (Tu bizane ku) mirov xwe jê (ji kirina nimêjê di wan demen mekruh de) muhafeze dike.

- 24/2 Ji paş ferda fecrê ku kir me^ç xuşû^ç
Dimînit heta roj ji meşriq tulû^ç
- 24/3 Ji wir pê ve jî ta bibit irtifa^ç
Bi qas rimhekî hem dema istiwa
- 24/4 Wuhareng ji paş ferda^ç esrê heya
Ku roj qet nemînit li ban û çiya
- 24/5 Di wê gav de jî hem heta ku tamam
Bibêtin gurûb hem xuya bit zelam
- 24/6 Ev e hukmê van penc(i) ewqat û dem
Ji geyr herema Mekkeha muhterem
- 24/7 Ji nav wan derîne ewê her mudam
Li wê der ne mekrûh e qet ne heram
- 24/8 Wuhareng ji rojan derîn cumêê
Di hîna 'stîwaê bidit fetweê
- [11b]**
[25] Babu Selatî'l-Cema'eh
- 25/1 Nimêja cema^ç et bizan ferdekî
Kifaye tu guhdar(i) be ey zekî
- 25/2 Ji me 'mûmî ra niyyeta iqtida
Bizan şert e da ku nebêtin sûda
- 25/3 Durust e ku jin iqtida kin bi mêt
Welê^ç eksê yek car tu caiz nedêr
- 25/4 Ji xunsa re qudwet bi mislê xwe nîn
Wuhareng bi unsa qe nîne yeqîn
- 25/5 Durust e ku unsa bi mislê xwe hem
Wuhareng bi xunsa bikit la cerem
- 25/6 Sehîh nîne hem iqtida muqtedî
Welê mêt bi mêran mudam *yeqtedî*¹⁷

24/3 Bi qas rimhekî] Bi miqdarê rim N2

- 25/7 Ji bo qariî her durust nîne qet
Li pê ê ji Fathê dixwînit gelet
- 25/8 Durust her bigêre ji dil guh bidê
Cema'et bitin ger di nêv mescidê
- 25/9 Derer nîne dûrbûn wuhareng hicab
Bilindbûn û nizmbûn û hem xelqê bab
- 25/10 Evan şert bigêre ji bo muqtedî
Cema'et bikin ku di geyr mescidî
- 25/11 Divê dûr nebit hem 'edem bit hicab
Tu hail nebêtin wekî xelkê bab
- 25/12 Bigir heddê qurbê tu sê sed zira'
Ji wê zêde bu' d e bizan bê nîza'

[12a]

- 25/13 Cihê ku durust e me gotin tamam
Bizan şert e zanîn bi halê îmam
- 25/14 Bi ru'yet weyaxud sima' a guhî
Divêt zanibit bi 'ntiqalatê wî
- 25/15 Ji me 'mûmê ra nîne teqdîm ebed
Li ser wî îmamê xwe qet ey weled
- 25/16 Tewafuq bizan şert e der intizam
Di ya muqtedî da we hem ya îmam
- 25/17 Xusûf û kusûf hem canaiz tamam
Li pê ferdê dîtir betal in mudam
- 25/18 Welê ferd bi neflan digel 'eksê hem
Sehîh wan bizane di her gav û dem

¹⁷ Li pey nimêj dike.

25/14 Bi hîna rukû' an û rengê sicûd
Divêt zanibit her wekî wan qu'ûd

[26] Babu Selatu'l-Muşafir

- 26/1 Nimêjên ruba^ç î bizan *yuqteser*¹⁸
Digel çend şurûtan yekî jê sefer
- 26/2 Sefer şazde fersex divêtin delal
Wuhareng dixwazit bitin ew helal
- 26/3 We hem niyyeta qesrê der niyyetê
Bi ê ku mutim qet nekit qudwetê
- 26/4 Dixwazit eda bit qeda jî eger
Bitin ew nimêj faita der sefer
- 26/5 Wekî qesrê hem cem^ç û teqdîm yeqîn
Digel cemê û teexîrê caiz bibîn
- 26/6 Dibit ^ç esr û nîvroj bi hevre cemi^ç
Wuhareng ^ç işaeyn(i) ey mustemi^ç

[12b]

- 26/7 Ji bo hadirî cem^ç û teqdîm bizan
Ku baran hebîtin li nik her duwan

[27] Babu Selati'l-Cumu'eh

- 27/1 Nimêja di cumêd bizan ferdu ^ç eyn
Li ser ên mukellef tevan dûne meyn
- 27/2 Kesê hur bitin hem tewettun zeker
Ku xalî bitin ew ji êş û derer
- 27/3 Cihê wî divêt gund û bajar(i) bit
Ji çil mêrê mezkûr(i) kêmtir nebit
- 27/4 Divêt her dû rekêet weya rek^ç etek
Cema^ç et bitin qet nekî reyb û şek

¹⁸ Têk kurtkirin.

27/2 Kesê hur bitin hem tewettun] Huriyyet tewettun divêt hem N2
27/24 qet nekî] tê nekî N2

- 27/5 Berî wî du xutbê divêtin yeqîn
Dem û tuhr û rabûn şurût jê re dîn
- 27/6 Wuhareng culûsa di nêv wan de her
Dixwazit ku qudret hebîtin li ser
- 27/7 Bizan pênc(i) rukn in ji bo xutbeê
Dema têtê xwendin di her cum' eê
- 27/8 Ji ewwel ve hemdê Xudaê mezin
Selat hem li ser seyîdê ins û cin
- 27/9 Wesiyet digel ayetê her bixwîn
Du' a hem ji bo mu'minan ecme' in
- 27/10 Dema yek ji şertan ' edem bit ji bin
Nimêja di nivroj divêt bê kirin
- 27/11 Li ser ehlê çol û xiyaman tunîn
Çiqas ku biseknin di hûr û sinîn
- [13a]**
- 27/12 Durust nîne cumê bibêtin ' eded
Eger boş nebit ew mekan û beled
- 27/13 Wekî boş bitin ger nebit ictima'
Di yek mescidê da nekit ittisa'
- 27/14 Durust e te' eddud li wê bê ' ilac
Welêkin ziyada qeder ihtiyac
- 27/15 Qeder ihtiyac ger bitin wê demê
Tu caiz bidêre cumû' an hemê
- 27/16 Welê j' ihtiyacê ziyade heman
Heçikê li paş wan beçal her bizan
- 27/17 Teqeddum ku me' lûm nebêtin yeqîn
I' ade ji bo zuhrê lazim bibîn
- 27/18 Bizan sunnet e xusl û paqijkirin

Wuhareng teteyyub nenûk jêkirin

27/19 Libasê spî hem sikût jî wusan
Ji bo istima^ç a xetîb(i) heman

27/20 Hêram e nimêj weqtê xutba şerîf
Ji geyr daxilê lê du rek^ç et xeffîf

[28] Babu Selati'l-Îdeyn

28/1 Muekked bizane nimêja du ^ç îd
Li ser ên mukellef *welêw hum ^ç ebîd*¹⁹

28/2 Ji paş rojê jê ra heta zuhrê dem
Ji wê şûnde dê bit qeda lacerem

28/3 Du re^ç ket nimêj in di wê hey'etê
Ku dest dane ser hev ji paş niyyetê

28/4 Divêt heft(i) tekbîrê dî ey delal
Ji geyr tekbîra niyyetê bê cidal

[13b]

28/5 Bi tesbîh û tehmîd û tehlîlê tev
Di nêv wan bixwûne welakin bi xef

28/6 Ji paş tekbîra wî qiyama duwan
Zikir ke tu tekbîra lê pênc bizan

28/7 Du xutbê wekî ê di cum^ç ê hemîn
Li paş wê divêt bête xwendin yeqîn

28/8 Bi neh tekbîra ibtida ewwelê
We ya dî bi heftan fetih ke welê

28/9 Di fitrê tu ehkamê fitran bibêj
Di edha ji bo edhiyan dur birêj

28/10 Di malan û sûk û digel mescidan

¹⁹ Welêw ew bende jî bin.

28/4 ey delal] biêl-êded, bê cidal] za neqed

Bi cehr û xefî tête tekbîr(i) dan

28/11 Welêkin ji megrîb şeva her dû 'îd
Heta ku duxûl bin nimêja di 'îd

28/12 Wuhareng ji subha 'Erefe wusan
Di paş ferd û nefl û qeda cumleşan

28/13 Heta esrê teşrîqê salis yeqîn
Qeti' ke tu tekbîrê xwe încunîn

[29] Babu Selati'l-Kusûfeyn

29/1 Ji her yek xusûf û kusûfên 'ecîb
Divêtin du re' ket nimêjên gerîb

29/2 Di her rek' etek da qiyam merreteyn
Wuhareng rukûe jî welê dûne meyn

29/3 Dirêj xwendina her qiyaman dixwaz
Digel tesbîhê der rukû' an diraz

[14a]

29/4 Sivik secde gotin di yek qewlekî
Dirêjbûnkirin mu' temed ey zekî

29/5 Di roj girtinê da qiraet bi sir
Welakin di hîvê divêtin cehir

29/6 Çi weqta fewat bit qeda jê re nîn
Fewat bi 'ncila yan gurûbê hemîn

[30] Babu Selati'l-Îstîsqa

30/1 Li yek qitrê ger qetr(i) bit ew êdem
Nimêj sunnet e jê ra der hîn û dem

30/2 Li ser wî îmamî divêt ewwela
Nida ket li nasan hemî mucmela

30/3 Emir kit li wan da bikin tewbe tev

Bikin xêr û xêrat fehêl kin li hev

30/4 Divêt rojê girtin li mal sê tamam
Di çaran bila derkevin tev siyam

30/5 Bi halek feqîrî tezellûl xuşû^ç
Nimêj kin welê meê hudûr û xudû^ç

30/6 Ji paş wê di xutbe wekî ê di ^çîd
Ne kêr û ziyade bizan her ekîd

30/7 Welêkin divêt bo xetîbi yeqîn
Bikit zêde terxîb û terhîb di dîn

30/8 We hem tekbîratan divêt kit bedel
Bi estegfirullah bizan bê zeel

30/9 Wuhareng du^ç a pur divêtin mudam
Bi xef eşkera hem qu^ç ûd û qiyam

30/10 Dema eşkera kir wî amîn dixwaz
Li ser ehlê mehder we ger ne niyaz

30/11 Ridaan bi carek bila wergerîn
Cihê jêr bibe jor yesar li 'l-yemîn

[14b]

30/12 Dema re^ç d û berqan veda ba edeb
Xu meşgûl(i) kin tev bi tesbîhê Reb

30/13 Bişûn xu bi seylê îze 's-seyl û sal²⁰
Digel şukr û hemdê Xuda werne mal

30/14 Eger ku nebarîn we ze 'l-halu dam²¹
I^ç ade ji wan re heye her mudam

[31] Babu Selati'l-Xewf

30/3 fehêl kin] helal kin N2

30/5 xuşû^ç] xudu^ç, xudu^ç] xuşû^ç N2

²⁰ Dema lehî rabû.

²¹ Eger ev reş bidome.

- 31/1 Nimêja di xewfê bi çend new^ç eyan
Ku e³da li geyr nahê qublê xuyan
- 31/2 Imam dê nimêj kit bi yek taife
We ya dî le hember^ç edûw waqife
- 31/3 Dema rek^ç eta taifê bû tamam
Divêt rek^ç eta dî ji xûr kin xitam
- 31/4 Di paş ku selam dan bi lez ew hemû
Biçin hem biseknin muqabil^ç edû
- 31/5 Bila taifa waqife ew jî bê
Bikin iqtida sef girêdin li pê
- 31/6 Ku rekêet tamam bû divêt bin qiyam
Ji bo ya duwan da ku din tev selam
- 31/7 Li alê di qublê ku kafir weqef
Hemî tev li pê wî girêdin du sef
- 31/8 Dema çû rukû^ç ê imam ey delal
Hemû tev digel biçne ta i^ç tidal
- 31/9 Çi weqta imam secde bir ewwela
Sefa ku li paş wî digel bit bila
- [15a]**
- 31/10 Sefa dî divêt bibne haris tamam
Heta ku ji secdan bibêtin qiyam
- 31/11 Di wê gav de ew jî biçin secdeê
Temam kin bi lez rabbitin fatheê
- 31/12 Di wê rek^ç eta dî emir bi³n^ç ikas
Biçin secdeê tev imam ên huras
- 31/13 We hem bibne haris ewê dî tamam

31/4 bi lez] divêt N2

31/13 we hem] divêt N2

Heta ku ji secdan qu'ûd kit imam

- 31/14 Bila ew jî secde bibin tev serî
Digel wî imamî selam din cemî
- 31/15 Welê new'ê salis ku hemye'l-wetîs
Bibit sing û dewran di kuffarê pîs
- 31/16 Wekî ku dikarin nimêj kin wusan
Çi maşî çî rakib bi çehv û seran
- 31/17 Di şer da dema ku silah bibte xwîn
Eger ku neavêt qeda jê re nîn

[32] Feslun fî Tehrîm Lubsi 'l-Ĥerîr 'ele'r-Rical

- 32/1 Ĥeram e li ser hindê mêrên kebîr
Bipoşin di ber xu libasê Ĥerîr
- 32/2 Digel ê murekkeb ji ibrîsimê
Ku ġalib bitin ew jî new'an hemê
- 32/3 Bizan têtê kiswetkirin pê seġîr
Digel ên kebîr jî welê der nefîr
- 32/4 Di wê gav de lê ku nebit ġeyrê wê
Weyaxud derûret bixwazit ewê

[15b]

- 32/5 Texettum wekî wê Ĥeram her bidêr
Welê ger ku xatem bibêtin ji zêr
- 32/6 Hemî ew helal in ji bona jinan
Çuku xeml û zînet dibêtin bi wan

[33] Kîtabu'l-Cenaiz

- 33/1 Ji bo merd(i) 'ibret mirin kafî ye
Xefî nîne ew her me pak zaniye

- 33/2 Dixwazit nekin em ewê qet ji bîr
Teheyyu ' divêt her ji bona mesîr
- 33/3 Welê bo merîdî divêtin ziyad
Wesiyyet bikit bo huqûqê ' ibad
- 33/4 Dema şexsê mu 'min bibêtin wefat
Ji bo wî li ser ' amê çar wacibat
- 33/5 Divêt bê kirin tev welê zû dixwaz
Ew in gûsl û tekfîn û defn û nemaz
- 33/6 Ji geyrî şehîdî nimêj jê re nîn
Wuhareng e şuştin welew tev de xwîn
- 33/7 Ji godekê ku di paş şexş mehan
Ji dê ra bibit wek kebîrî bizan
- 33/8 Bitin ger mirî ew we ger sağ(i) bit
Qe ferq nîne tê da ji dil hifzê kit
- 33/9 Welê ger ji pêş şexş mehan bit suqût
Bizan seqt e tefsîl divêt der hubût
- 33/10 Livandin hebêtin weyaxud girîn
Ewî jî wekî êd mezin her bibîn
- [16a]**
- 33/11 Welê ger nebêtin ji wan yek eser
Belê şikl û sûret tamamen zeher
- 33/12 Nimêj nîne bo wî bizan wê demê
Heçî mabeqa wacib in tev hemê
- 33/13 Xuya ger nebit şikl û sûret yeqîn
Veşartin tenê musteheb jê re dîn
- 33/14 Zimmî hem digel ehlê êehd û eman
Li ser wan heram e nimêj her bizan
- 33/15 Gerandin durust şuştina wan ji bin

33/8 Bitin ger mirî] mirî ger bitin N2

Welê defn û tekfîn(i) lazim kirin

33/16 Ewê d' herbiyan tev wekî çûçikan
Durust e tu wan bavê ber kûçikan

[34] Feslun Fî ğusli'l-Meyyit we Tekfînih we's-Selatu 'Eleyh

34/1 ğusil wacib e wek me gotî li pêş
Divêt pakkirin ew ji hindê qirêj

34/2 Wekî ê di sax wan bişo ba edeb
Welê niyyeta ğasilî musteheb

34/3 Bila sê ğusil bit çû qenc e wutir
Di ya ewwelê da hebit hin sedir

34/4 Weya axirî safî av bit xelîl
Ji kafûr(i) tev bit welêkin qelîl

34/5 Eqellê kefen yek ku satir bitin
Welakin divêt pak û tahir bitin

34/6 Welê ekmelê sê lefaif bizan
Temamê seţir kit ji ğeyr muħriman

34/7 Durust nîne seţra serê wan heme
Digel rûçikê wan jinê muħrimê

[16b]

34/8 Kefen sunnet e ku sipî bit tamam
Dema sağiyê lê nebêtin heram

34/9 Nimêja ewan ferd e lêkin ne 'eyn
Kifaye bizan ey bira dûne meyn

34/10 Di wê da hene çar(i) tekbîr tamam
Di paş ya ûla Fathe xwendin mudam

34/11 Li dû ya duwan zû ke ey ba wefa
Selatên di pak her li ser Mustefa

- 34/12 Du‘ a kin ji bo meyyitê me‘ xudû‘
Li pê ya siyan tev bi qelbek xuşû‘
- 34/13 Ji bo wî we hem xu rica bikne ‘ am
Li paş ya di çaran bidin tev selam
- 34/14 Ji paş hilgirin wî li ser çar(i) dar
Bibin wî bi meşyek sekîne weqar
- 34/15 Ji hindam serê wî bi rifq û bi lîn
Dirêj kin ewî ser teniştayemîn
- 34/16 Li nahê di qublê bidin wechê wî
Ji paş muntezem sed bikin lehdê wî
- 34/17 Du meyyit di qebrek durust nîne ger
Derûret hebit wê demê *yugtefer*²²
- 34/18 Ji qebrê ra kûrbûn divêt ey fulan
Hîfîz bit ji heywan û hem raiman
- 34/19 Bi miqdarê bejn û digel bestekê
We hem da çikînin li ser sexrekê
- 34/20 Ji bo ehlê wî her divêt te‘ ziye
Mudam ta bi sê roj ji bo tesliye
- 34/21 Li ser meyyitan tev buka û girîn
Nebêtin eger newh û şeq xem tunîn
- [17a]**
[35] Kîtabu’z-Zekah
- 35/1 Di pêncan zekat wacib e ey ceger
Mewaşî digel her dû neqd û semer
- 35/2 Zurû‘ jî wuhareng ticaret di mal
Divêt her ji bo wan yekayek meqal

34/15 Ji hindam] Ji alê N2

²² Tê efûkirin.

35/1 Wucûba zekatê bizan yu‘ teber
Di en‘ am û neqdeyn [û] zer‘ û semer N2

35/2 Zurû‘ jî wuhareng] Ew in pênc tamam hem N2

- 35/3 Welê şert e bit muslim û hur mudam
Nisab jî hebit hem bitin mulkê tam
- 35/4 Temam hewl divêt xeyr di zerê û semer
We hem sewm welê *fi'n-ni' em yu' teber*²³
- 35/5 Bizan sê qisim tête gotin ni' em
Dewarê di reş hem cimal û gênem
- 35/6 Nisaba devan pênc tamam ger hebin
Zekat tê da şatek ji mih yan bizin
- 35/7 Wuhareng e şatek bizan' be tu qenc
Di her pêncekî ta bitin bîst û pênc
- 35/8 Dema bîst û pênc bûn tamam ey ' ezîz
Zekat tê da bint û mexadek temîz
- 35/9 Bizan ferz e bintek lebûn ey weled
Dema sîh digel şeş tamam bit ' eded
- 35/10 Ku şeş bit ziyade li ser erbe' in
Bizan ferz e hiqqe di hingam yeqîn
- 35/11 Çi hîna tamam bit ji wan şêst û yek
Ji nêv wan zekatê derîn cez' eyek
- 35/12 Dema pazdeyên dî li wan zêde bûn
Di wan de dibit ferz e bintey lebûn
- [17b]**
- 35/13 Temam ku bitin not û yek bê guman
Bizan wacib in wê demê hiqqetan
- 35/14 Sed û bîst û yek ger bibêtin yekûn
Di wan de zekat sê benatê lebûn
- 35/15 Ji ha paş bizan qa' ida kullî ye
“Febintu lebûn” ferza her çillî ye

²³ (Sewm) ji bo heywanan e.

- 35/16 Welê hiqqe jî ferz e daim heman
Di her pênciyî da bizan bê guman
- 35/17 Ewan musmeyatên me gotin tamam
Divêt bête tefsîlkin bo ‘ewam
- 35/18 Çi şata ku itlaq bibêtin ji dan
Ew e ya durust bit ji bo edhiyan
- 35/19 Wuhareng e şata bizin jê murad
Divêt salekê ev ji wê bit ziyad
- 35/20 Tu bint û mexadî bizan sahibî
Deva ku ewê ‘umr(i) yek sal(i) bî
- 35/21 Wuhareng e bintu lebûn ey delal
Ew e ya ji ‘umrê tamam kit du sal
- 35/22 Welê ger bitin ‘umr(i) sê sal tamam
Ji bo wî re hiqqe dibên der kelam
- 35/23 Dema çar tamam bit dibit cez‘ e pak
Tu hemdê Xuda ke ‘*ela ma hedak*²⁴

[36] Feslun Fî Zekati’l-Beqer we’l-ğenem

- 36/1 Dewarê di reş nîne tê da ebed
Heta ku nebit sîh tamam bi’l-‘eded
- 36/2 Dema sîh tamam bit birader serî‘
Zekatê ji nêv wan derîne tebî‘

[18a]

- 36/3 Wuhareng musinn e zekat ferz e her
Dema ku tamamî bitin çil beqer
- 36/4 Mudam her wuha pak hesab ke ji dil

²⁴ Ji ber riya rast ku nîşanî te kiriye.

[36] Feslun fî zekati’l-beqer we’l-ğenem] feslun fî zekati’l-beqer N2
36/2 birader serî‘] li nik wî cemi‘ N2

Sihan de tebîc hem musinn e di çil

- 36/5 Nisaba pezê çil tamam her bibîn
Pezek her zekatê ji nêv wan derîn
- 36/6 Wuhareng yek e ta sed û bîst û yek
Di wê gav de du tu bizan bê henek
- 36/7 We hem du bizan ta bibêtin du sed
Digel yek dibit sê zekat ey weled
- 36/8 Welê hem dimînit heta çar sedan
Dibêtin çihar pak hîfiz ke ewan
- 36/9 Ji ha paš bizan qa^c ide rast(i) hat
Serê her sedî yek bigêre zekat

[37] Feslun Fi'l-Xelteh we Şurûtiha

- 37/1 Di her du xelîtan zekat têt hesab
Wekî yek murovî welê der nisab
- 37/2 Divêt meşreb û mer^c a mehleb beran
Bitin yek digel mesreh û hem şivan
- 37/3 Wuhareng merah jî wekî wan tamam
Eva heft şurût tev divêtin mudam

[38] Feslun Fî Zekatî'z-Zer'

- 38/1 Zirû^c ê zekatê divêt qût(i) bit
Welêkin bi şert ew ku mezrû^c (i) bit
- 38/2 Cemî^c ê simaran zekat tê de nîn
Ji geyr fêkiyê kerm û nexlan yeqîn
- [18b]**
- 38/3 Nisaba ewan pênc(i) wisq in hema
Zekat ^cuşr e ger av ji ava sema
- 38/4 Ewên ku bi nedhan bibit av(i)dan
Zekat nîvê ^cuşr e bizan her zeman

- 38/5 Tu miqdarê wusqan divêt ger bi sa^ç
Ew in şêst tamam der cemî^ç ê buqa^ç
- 38/6 Bi emdada sa^ç çar(i) mudd in yeqîn
Bizanit welê tu di her weqt û hîn
- 38/7 Welê wezna mudda bi wezna ^ç Iraq
Bigir ritl û sul^ç sek tamam bi ^çt-tîfaq

[39] Babu Zekati'n-Neqdeyn

- 39/1 Bizan zêr û zîv ku nisab tê hebit
Zekat lazim e gerçi medrûb nebit
- 39/2 Ji xeyr herçi xişrê jinan lew bitin
Mukesser ku islah(i) mumkin bitin
- 39/3 Kesê ku li nik bîst(i) misqal ji zêr
Zekata ewan nisfê misqal bigêr
- 39/4 Du sed dirheman hem nisabê bibîn
Ji zîv ra di wan pênc zekat in yeqîn
- 39/5 Ziyada li ser wan bi keyf û reqis
Hisab ke di hir da qe nîne weqis
- 39/6 Zekata di malê ticaret yeqîn
Wekî neqd e lê piştî hewlê derîn
- 39/7 Çi neqdê ku ewwel şira pê bitin
Divêtin bi wî bête teqwîmkirin

[19a]

- 39/8 Ji paş ku ewî pak tamam kir hesab
Wekî neqd e ew der qeder hem nisab
- 39/9 Ji me^ç den eger ku deranîn ji wan
Divêt rub^ç ê ^çuşrê welê ew zeman
- 39/10 Eger xizne bit ew jî ew gav welê
Xumus ferz e tê da bizan her welê

39/11 Bizan nîn e hewl qed di van her duwan
Ji paş ku deranîn divêt bête dan

[40] Babu Zekati'l-Fitr

40/1 Ji meğrib şeva 'îdê fitrê bizan
Dibit fitre wacib li ser mu'minan

40/2 Welê ger li nik wî hebêtin ji mal
Ziyade ji qûtê cemî'ê 'iyal

40/3 Di ew şev digel roja 'îdê tevan
Divêt zêde bit hem ji hacatê wan

40/4 Ji ewwel meha rojyê têtê dan
Dimînit heta roja 'îdê heman

40/5 Ji paş wê dibêtin qeda ey delal
Çi gava deranî bizan bê meqal

40/6 Bizan sa' e miqdarê her fitrekê
Biçûk û mezin tev di her qitrekê

40/7 Çi qûtê ku xalib bitin ew zeman
Ji wî cinsî fitre divêt bête dan

40/8 Li ser şexsê wacib ji ber 'ebdê xwe
Derînit digel zewc û ewladê xwe

[19b]

[41] Feslun Fî Men Tusrefu ileyhimu'z-Zekah

41/1 Ji bo heşt(i) eqsam zekat têtê dan
Ew in heşt(i) qismên Xuda kir beyan

41/2 Feqîr û wuhareng mesakîne me
Mukatib we hem daxilê dîne me

41/3 Heçî 'amilîn hem tevî rêwîyan
Wuhareng e xarim digel xaziyan

41/4 Evan heşt(i) qismê ku hat famkirin
Ku mewcûd(i) bin tev divêt 'amkirin

- 41/5 Eger hin ji wan qisma bit in' idam
Ewên dî bi danê bigîr tev de 'am
- 41/6 Ji her qismekî sê murov bê guman
Weya zêdetir jî divêt bête dan
- 41/7 Imam ger belav kit zekatê yeqîn
Li ser wî tu te' mîmê wacib bibîn
- 41/5 Ji bo kafir û ' ebd û alê Resûl
Digel egnîyan nîne dayîn qebûl
- 41/6 Ji geyr xarim û gaziye'n serbilend
Ji bo wan durust e welew dewlemend

[42] Kîtabu's-Siyam

- 2/1 Ku şe' ban tamam bû weya dîn hilal
Divêt rojîgirtin bizan bê meqal
- 42/2 Li ser ên mukellef tevan ferz bibîn
Ku e' zar li nik wî nebêtin yeqîn
- 42/3 Bi şev şert e niyyet ku ferz bit siyam
Ji ber kullê rojan bizan her mudam

[20a]

- 42/4 Welê ger siyam bit ji neflan yeqîn
Bi şev ta berî zuhrê dem jê re dîn
- 42/5 Li ser saimî şert e imsak delal
Ji her tiştê rojî dibit pê betal
- 42/6 Cima' huqne û qey' û riddet ji bin
Digel xwarin û avê tev mubtil in
- 42/7 Di ' îdan û teşrîq û hem rojê şek
Durust nîne rojî bizan bê henek

[43] Feslun Fî Mucibi'l-Keffareh we'l-Fidyeh

- 43/1 Kesê ku di şehra mubarek yeqîn
Cîma^ç ket bi roj 'amîden jê re dîn
- 43/2 Kefaret li ser wî weha reng qeza
Dixwazit bizan bê xilaf ev ceza
- 43/3 Divêt 'itqê yek 'ebdê mumin qewî
Welê ger ku qudret hebêtin li wî
- 43/4 We ger nedivêt rojîgirtin du mah
Li pey hev mudawim li wechi 'l-ilah
- 43/5 Li ser rojiyê jî ku qudret nebit
Divêt şêst(i) miskînê îtêam(i) kit
- 43/6 Çi şexsê ku bimrit li ser wî siyam
Hebêtin welê ger bivêtin te^ç am
- 43/7 Derfînit ji ber rojiyek muddê heb
Weya bigritin rojiyê *in eheb*²⁵
- 43/8 Murovê ji pur ' umrê bit pişt(i)xwar
Durust e bixut ger nebit iqtidar
- 43/9 Li ser wî qeza nîne lêkin eda
Dixwazit ji ber kullê rojan fida
- [20b]**
- 43/10 Jina hamile ya bi şîr jî wusan
Bi sewmê zerer ger hebêtin li wan
- 43/11 Durust e bi fitrin guneh nîne qet
Li ser wan qeza her divêtin feqet
- 43/12 Welê ku bi fitrit ji ber godekî
Divêt fidye jî kullê roj muddekî

43/1 Kesê ku di şehra mubarek yeqîn] bi rojî di şehra emîn N2

43/2 li ser wî weha] deranîn ew reng N2

43/3 Welê ger] Welêkin N2

²⁵ Eger bixwaze.

43/13 Kesê ku qezaê xwe texîr(i) kat
Heta rojîyek dî bi ser wî re hat

43/14 Kefaret ji ber kullê rojan delal
Divêt hem *yukerrer*²⁶ bi tekrîrê sal

[44] Babu'l-I' tikaf

44/1 Ji bo muéminan sunnet e i' tikaf
Di nêv mescidê da di her weqt û gaf

44/2 Welêkin dema nezr(i) kit ey delal
Dibit ferz(i) ew dem bizan bê meqal

44/3 Ji bo wî hene hin şurût nûrebîn
Musulman û temyîz û mescid yeqîn

44/4 Wuhareng e niyyet welêkin eger
Bitin ya nezir ferziyet yu' teber

44/5 Tu mubtil cunûn û cîma'ê bizan
Wuhareng e heyz û nifasê jinan

44/6 Xurûc jî welê ger nebit 'uzr(i) hem
Welêkin ku e' zar hebit nîne gem

[45] Kîtabu'l-Hecc

45/1 Heçî ku mukellef welê dewlemend
Xuda hecc û 'umre li wan kirye ferd

[21a]

45/2 Welê ger ku mumkin bitin çûn heman
Nebit xewf û tirs hem bitin rê eman

45/3 Divêt wacidê zad û hem rañile
Ziyade ji qûtê hemî 'aile

45/4 Ji heccê ra erkan bizan bê xilaf

²⁶ Bê tekrarkirin.

Se'î helq û ihram wuqûf û tewaf

- 45/5 Wuqûfê tenê tu ji nêv wan derîn
Ewên dî ji ' umrê ra erkan bibîn
- 45/6 Ji mîqatê ihramê wacib bizan
Wuhareng e remya cemaran tevan
- 45/7 Wuhareng mebîta li Muzdelifê
Digel yê Minayê ne ya ' erefê
- 45/8 We hem terkê libsê mexît bê nizaè
Ev in wacibat hem tewafa widaè
- 45/9 Bizan sunnet e telbiye hem tewaf
Digel ya qudûmê bizan me' xilaf
- 45/10 Du rek' et nimêjên tewafê wusan
Sipîbûn ji bona ' izar û ridan

[46] Babu Muherremati'l-Ihram

- 46/1 Ev in deh xisal tev li ser muhrikan
Heram in kesê kit divêt fidyedan
- 46/2 Libasê durûtî welê li 'z-zeker
Digel setra ser ku nebêtin derer
- 46/3 Wuhareng e setra wucûhê jinan
Nenûk jêkirin por birîn jî wusan
- 46/4 We hem qetlê seydan di her gav î dem
Li ser ên helal jî welê der herem

[21b]

- 46/5 Nikah û cima' hem tela'ub bi wan
Welakin bi şehwet teteyyub wusan
- 46/6 Dixwazit fida bo cemî'ê xisal

Ji geyrî nikahê bizan ew betal

46/7 Nenûkek heye tê da muddek duwan
Dixwazit du mud hem welê şe' retan

46/8 Bizan hecc û 'umrê dibêtin betal
Bi wet 'ê berî ku bitin ew helal

46/9 Wuhareng e wacib dibêtin hedî
Qeza hem *me'e's-se'yi fi'l-fasidî*²⁷

46/10 Kesê ku wuqûf lê bibêtin fewat
Bi e' malê 'umrê tehellul dikat

46/11 Eger ruknekî dî fewat bit li wî
Tehellul qe nîne heta fi' lê wî

46/12 Ku wacib li wî fewt(i) bit ey delal
Li ser wî pezek lazim e bê meqal

[47] Feslun Fî Eqami'd-Dîma'

47/1 Cemî'ê dimaê dibit pê cebir
Di pênc qismê ha tev hemî munhesir

47/2 Heçî wacibat ku bitin terk ji wan
Muretteb muqedder ew e her bizan

47/3 Ji ewwel ve şatek divêt ser jê kit
Ji paş wî siyam lê ku qudret nebit

47/4 Siyam deh divêtin ji rojan tamam
Sisê fi'l-herem heftê dî *in eqam*²⁸

47/5 Welê qismê sanî muxeyyer bizan
Wuhareng muqedder bizan bê guman

[22a]

²⁷ Dema mirov ji bo tiştên betal kedê xerc bike.

²⁸ Dema vegere mala xwe.

47/4 Sisê fi'l-herem] Sisê jê di hec N2

- 47/6 Bi helqê digel nehwe qessi 'z-zufer
Bizan yek ji van her siyan mu' teber
- 47/7 Pezek ya ne sî roj(i) rojî tamam
Weyaxud divêt ew derfînit te' am
- 47/8 Bidet şeş mesakinê ehlê herem
Bi her şexsekî nisfê sa' yultezem
- 47/9 Welê qismê salis ji dil guh dinê
Muğeyyer mu' eddel bi seyd kuştinê
- 47/10 Eger seyd hebit mislê wî fi 'n-ni' em
Dixwazit zebih kit ewî der herem
- 47/11 Weyaxud derfînit ji ber wî ve heb
Bi miqdarê siêra ewî *in eheb*²⁹
- 47/12 Weya rojiyê bigritin ey zekî
*Yusamu*³⁰ ji ber kullê mud rojekî
- 47/13 Di sewm û te'amê muğeyyer be bîn
Nebîtin eger mislê seydê yeqîn
- 47/14 Muretteb mu' eddel bizan ê çihar
Ku wacib bitin ew bi men' û hisar
- 47/15 Dixwazit pezek bête serjêkirin
Ku qudret hebêtin divêt bê kirin
- 47/16 Weger ne dixwazit derfînit te' am
Qeder qîmeta şata mezkûr tamam
- 47/17 Li ser qîmetê jî ku qudret nebit
Bi miqdarê mud rojî wacib dibit
- 47/18 Wekî ê çihar qismê pêncan bigêr
Muretteb mu' eddel ji dil guh bidêr

47/7 divêt ew] bera ew N2

²⁹ Eger bixwaze.

³⁰ Rojî tê girtin.

47/19 Kesê ku cima‘ê bikit ey delal
Li ser wî divêt ev ceza bê meqal

[22b]

47/20 Welakin ji ewwel be‘îr mu‘teber
Ku qudret nebit yek ji cinsê beqer

47/21 Ji wî jî ku ‘aciz bitin heft genem
Ji paş wî te‘am lê ku bit ew ‘edem

47/22 Te‘am jî bi si‘ra be‘îrî dixwaz
Bi ‘edla wê rojê ku bit in‘icaz

47/23 Bizan hedy û iteam divêt der herem
Welêkin *siyam fihî la yultezem*³¹

47/24 Vexwarin ji ma zezemê musteheb
Ji bo dîn û dunya tedelluê eheb

47/25 Welê sunnetek dî heye nûrebîn
Ji her sunnetên dî tu mestir bibîn

47/26 Ew e dewletek pur mezin bê hisab
Ziyaretkirin şahê ‘alî cenab

47/27 Şehê ebtehe Mustefaê kerîm
Resûlê Xuda pêşîwaê ‘ezîm

47/28 Muhammed ‘eleyhi‘s-selat û selam
Li ser wî mudawim bitin ta qiyam

47/29 Digel al û şehbê wî hem tabi‘în
Li ser wan mudawim bitin ecme‘în

47/30 Xudaya bi cahê hebîb ey Xuda
Bigêre ji bo me şefî‘ Eħmeda

47/31 Bi ismê Xuda kir me bed‘a kelam
Bi namê te ya Reb me kir ixtitam

³¹ Li Heremê rojgirtin lazim nabe.

Qed temme te'lıfu hazihi 'r-Rîsaleh 'ela yedi'l-feqîri 'z-zelîl 'Ebdu'l-Celîl xelet minhu şehre rebî' u'l-axer senete 1367.

ÇAVKANÎ/KAYNAKÇA

Adak, Abdurrahman, “Di Edebiyata Kurdiya Klasîk de Cureyeke Edebî: Zanistên Îslamî”, Nûbihar, j. 132, Havîn 2015, r. 5-9.

Çelebioğlu, Amil Çelebioğlu, “Türk Edebiyatında Manzum Dini Eserler”, Şükrü Elçin Armağanı, Ankara 1983, s. 153-166.

Çiftçi, Metin, *Eqîdenameyo Zazakî yê Mela Mehemedê Hezanîyî*, Yaşayan Diller Enstîtüsü, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bingöl, 2015.

Îmamzade, Muhammed Îmamzade, “Fîqh ê Menzûm ê Şî’e Der Du Qernê Exîr”, *Mutale’atê Îslamî: Fiqih û Usul*, sal: 41, Şomare, 83/1 Payîz û Zimistan, 1388, r. 11-42.)

Karaman, Hayrettin, “Fıkıh”, *DİA*, İstanbul, 1996, XIII, 1-14.

Kelpeten, Hatice Kelpeten, “İlmihal”, *DİA*, İstanbul 2000, XXII, 139-141.

Kırkıl, “Harun, Türk Edebiyatında Manzum İlmihal ve Fıkıh Kitaplarıyla Son Devre Ait Manzum Bir İlmihal: Manastırlı Mehmet Rıfat Bey ve Manzum İlmihali”, *İslam Hukuku Araştırmaları Dergisi*, j. 7, Nisan 2006, s. 433-476.

Kurt, Mehmet Tahir, Berhemek Kurdî ya Derheqê Fiqhê Sefîna Kurdan û Latînîzekirina Wê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Mêrdîn, 2015.

Levend, A. S. "Dini Edebiyatımızın Başlıca Ürünleri", *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten*, 1972, 2. Baskı, Ankara 1989, s. 35-80.

Mele Abdulcelîlê Botî, *Rîsaletû Sefînetu'l-Ekrad İla Sebîli'r-Reşad*, Destxet (N1), Pirtukxaneyâ Taybet ya Hayrullah Acar

Mele Abdulcelîlê Botî, *Rîsaletû Sefînetu'l-Ekrad İla Sebîli'r-Reşad*, Destxet (N2), Pirtukxaneyâ Taybet ya Hayrullah Acar

Serfiraz, Mesut, “Türkçe Kürtçe Bir İlmihal”, *Kürt Tarihi*, j. 5 (Sibat-Adar), İstanbul, 2013, r. 55-60.

Tan, Altan, *Turabidîn'den Berriyê'ye*, Nûbihar, İstanbul, 2011, r. 282-287.

Tuzcu, Kemal, “Klasik Arap Şiirinde Didaktik Şiirler”, *Ankara Üniversitesi Dil ve Tarih-Coğrafya Fakültesi Dergisi*, 47, 2, r. 147-171, Ankara, 2007.

Yıldırım, Kadri, “Didaktik Şiirin Abbasiler Döneminde Ortaya Çıkışı ve Gelişimi Üzerine Bir İnceleme”, *Uludağ Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Cild 18, s. 1, Bursa, 2009. r. 171-207.

Yıldız, Alim Yıldız, Müellifi Meçhul Bir Şurûtu's-Salât Mesnevisi, *C.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi XIII/2 - 2009*, 175-187.